Casimê Celîl

# XOZAN

Institut kurde de Paris

23

STOKHOLM 1982

89.CEL

Institut kurde de Paris

K.L. 223

Casimê Celîl

922 CEL ZOZ

FONDS
M. REMZI BUCAK

# ZOZAN

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
ENTRÉE N° 2272

STOKHOLM 1982

Weşanên Roja Nu : 5

Navnîşan:

BOX 4038

141 04 Huddinge/Sweden

Institut kurde de Paris

ISBN 91 7672 005 5

Bokförlaget Roja Nu

Copyrigt Casimê Celîl

Printed in Sweden

Stockholm 1982

Axlings Tryckeri AB, Södertälje



**CASIMÊ CELIL**

Institut kurde de Paris

# ŞAYİRÊ NASKIRİ

**BABAÊ KELEŞ**

Navê Casimê Celîl pêşdaçûyîna kûltûra kurdêd sovêtîêra girêdaye. Ew endamekî wê silsileta înteligênsîa meye pêşîne, ya ku kevirê hîmê lîtêratûra kurdaye sovêtîê danî û xwe jî bû sazdarekî wê lîtêratûraê. Û eva pêncî salî zêdetire, wekî ew li rya lîtêratûraêye dijvarra dimeşe, lîtêratûra miletîê bi efrandinêd xwexwetîê û tercmêd klasîkêd cimetêd mayînra dide dewlemendkirinê.

Casimê Osêê Celîl sala 1908-a gundê Qizilqulêda (nehîya Dîgorê, qeza Qersê) ji dya xwe bûye. Bavê Casim gundîkî kesîb bû. Û hela biçûktîêda Casim telya emir texmînkir.

Kurkê biçûk teze pêra gîhandibû xêr û şera dinê fembike, gava şerê hemdinyaêyî pêşin destpê bû. Sala 1918-aye çetin gele-gele malara tevayî usa jî mala bavê Casim ji yêr-miskenê xwe leqya,dero-dero bû û xwe rya xerîbe nenas girt.

Paşê şayîr, gava ew roja bîr anîne, nivîsîye:

Derbaz bûm ji bestê xike-xalî,
Derbaz bûm gundê kambax, bê merî,
Bavê min ez dibirim, dilda saw bû,
Direvyan, diçûn, berbi ku nizanbû.

Mala bavê Casim ji şûrê qetlê revî, çawa paşê şayîr dinivîse, nava "xûnê û cinyazara" hat,gihîşte nehîya Aparanê.Lê vê carê jî xelayê û nexweşîyê ber derê wana çok verdan û nava çend mehada ji

Institut kurde de Paris

mala giran tenê Casimê 10 salî ma.Ew mecbûr bû de-
rê êtîmxana bikute. Pêşîê kete êtîmxana Alêksand-
rapolê (Lênînakana naha), paşê jî kete êtîmxanêd
Celaloxlîê (Stêpanavana naha) û Yêrêvanê. Zûtire-
kê Ermenîstanêda qeydê sovêtîê hate tesdîqkirinê.
Û çawa pêşîya bi hezar-hezar êtîma, usa jî pêşîya
Casimê biçûk rya emre bextewar vebû. Sala 1927-a
Casimê komsomol (ew sala 1925-a nava cêrgêd komso-
molada hatibû qebûlkirinê) xweyê xwendina ortê pê
avîte ser rya emir.

Salêd 1927-1931-ê Casimê Celîl mektebêd Bakûê û
Tibîlîsîêye eskerîêda hîn dibe. Hema vêderê jî sa-
la 1930-î ew nava cêrgêd Partîa Komûnîstîêye Tfa-
qa Sovêtîêda tê qebûlkirinê.

Sala 1931-ê Casimê Celîl dixebite çawa dîrêkto-
rê têxnîkûma kurdaye Pêşkavkazêye pêdagogîê. Sala
1932-1938-a ew neşîreta Ermenîstanêye dewletêda
dixebite çawa serwerê para lîtêratûra kurdî û rê-
daktorê cabdar. Casimê Celîl wan sala rêdaktorîê
gelek kitêba dike, berevokêd efrandinêd nivîska -
rêd kurdêd sovêtîeye pêşin hazir dike û dide ne-
şirkirinê, tevî hazirkirina kitêbêd dersê zimanê
kurdî dibe.

Lê destanîna xwendina bilind, dewlemendkirina
zanebûna tabetî nedidane Casimê cahil(ciwan-R.N.).
Sala 1938-a ew fakûltêta înstîtûta Yêrêvanêye dew-
letêye ziman û lîtêratûraêda tê qebûlkirinê û sala

Institut kurde de Paris

1941-ê bi açixî kuta kir. Xwendinêra tevayî ew usa jî dixebite çawa dîrêktorê mekteba Yêrêvanêye ser navê Nar Dose êvarê.

Sala 1955-a radîoa Ermenîstanêda para xeberdanêd kurdî vebû. Casimê Celîl hate kivşkirinê çawa rêdaktorê wê parê. Bi serwerya Casimê Celîl hîmê berevkirin û nivîsara stranê kurdî li radîoa Ermenîstanê hate danîne. Wextê wîda hezarî zêdetir kilam û miqamê cimeta me hatine nivîsarê û ji undabûnê xilas bûne.

Ji sala 1972-a heta van pêla Casimê Celîl dîsa neşîreta Ermenîstanêye dewletêda serwerê para lîtêratûra kurdî dikir.

Rîya Casimê Celîle efrandaryê ji salêd sîîda destpê dibe. Hema wan sala bû, wekî efrandinêd wîye xwexwetyêye ewlin û tercme rûpêlêd gazêta "Rya Teze"-da hatine neşirkirinê. Ji berevoka efrandinêd nivîskarêd kurdaye sovêtyêye dudada destpêkirî efrandinêd Casimê Celîl wanda cîkî berbiçev digrin. Ewî bi xwe çend berevokêd usa hazirkirine, rêdaktorî wan kirîye.

Ji salêd 30-da efrandinêd H.Tûmanyan û A.Pûşkîn tercmeyî zimanê kurdî dike. Salêd 30-da ew çend efrandinêd H.Tûmanyan bi kitêbêd başqe bi tercma zimanê kurdî dide neşirkirinê. Sala 1949-a bi tercma C.Celîl berevoka şîêr, çîrok û proza Pûş - kîn bi zimanê kurdî ronayî dibine. Xwendevanêd kurd mecal stend bi zimanê dê efrandinêd klasîke-



Institut kurde de Paris

kî lîtêratûra hemdinyaêyî berbiçev bixûne.

Bi hazirkirina C.Celîl salêd 1936-a û 1953-a bi zimanê ermenî du berevokêd efrandinêd şayîrêd kurd hatine neşirkirinê, kîjana nasîya xwendevanêd ermenî didane destanînêd lîtêratûra kurdaye sovêtîyê.

Ji sala 1954-a hetanî sala 1966-a çar berevokêd efrandinêd Casimê Celîl - "Elegez", "Beyt-serhatîyêd kurdaye evîntîyê", "Kanîya dê", "Ocaxa min"bi zimanê ermenî hatine neşirkirinê, kîjana Casimê Celîl dane naskirinê çawa şayîrekî kurdê sovêtîyêyî berbiçev. Sala 1956-a gazêta "Pravda"-êda şiêra Casimê Celîle "Lênîn", lê sala 1963-a gazêta "Îzvêstîa"-êda şiêra wîye "Çîaêd Kurdistanê" hatine neşîrkirinê.Sala 1968-a Moskvaêda berevoka efrandinêd Casimê Celîle bjare bi sernivîsara "Bi rêêd wede" neşir bû. Xwendevanê welêt efrandinêd şayîrê kurdra bûne nas, kîjan bi lîrîka nazik, bi dilekî sax pesnê emrê meyî îroyîn dide, derheqa yazîya pareke cimeta xweye bextewar, ku welatê sovêtada dijî, dinvîse.

Sala 1960-î bi zimanê kurdî berevoka Casimê Celîle "Rojê min" neşir bû. Gereke bê gotinê, wekî ev berevoka nava efrandinêd Casimê Celîlda cîê xweyî layîq digre. Virada goveka fikirmîşbûna şayîr diha fireye, sifetêd ku ewî bijartine, hewaskarin û hukumkirin.

Sala 1970-ê berevoka şayîre "Kilamê çîa", lê sala 1975-a berevoka "Oda kurda" bi zimanê kurdî neşir bûn. Van berevokada şiêrêd teze û usa jî veçêkirina çend nimûnêd zargotina cimeta kurda, ku derheqa şerkarya wêye azadaryêdane neşir bûne.

Sala 1980-î berevoka Casimê Celîle nû "Kurdê bengî" neşir bû. Efrandinêd vê berevokê nîşan didin, wekî şayîrê meyî hizkirî, nenhêrî salê xwe (ew îdî ji 70-î debaztire) hela bi kela cahiltyêva diefrîne.

Şiêr û poêmêd vê berevokê pesindayîna emir û xebata merivêd sovêtîyêye, efatî û mêrxasya wêdane.

Têma şerkarya cimeta kurdaye miletyê - azadaryê gelekî nêzîkî dilê şayîre, û bi vê temaê ewî gelek efrandinêd giranbaha sazkirye. Vê berevokêda "Kilama Hozbek" û Poêma şerkaryê" neşir bûne, ku destanînêd poêzîya kurdaye sovêtyene.

Casimê Celîl îro xudanê gelek berevokêd şiêr û poêmana. Ewî usa jî bi hostatî gelek nimûnêd zargotina me veçêkirine. Ji salêd 30-da hetanî niha kitêbêd dersê zimanê kurdî hazir dike.

Casimê Celîl pesindarê rojê meye, pesindarê wetenê sovetîyê û cimeta xweye bextewaare. Ew yazîya cimeta xwe ji yazîya cimetêd welatê meyî mezine mayîne biratyê nade başqekirinê, pêşdaçûyîn û gulvedana cimeta xwe altindarya seyasetya partya Lênînyêye miletîêye aqilbendra dide girêdanê. Şiêrêd "Lênîn", "Oktyabir", "Wetenê min" û gelekêd

mayînda ew pêşda tê çawa dibêjê dostya cimeta, te refdarê edlayê û heqyê.

Komekdarya Rûsya mezin
Û cimetê biratî,
Xweyê xwelîê îro emin,
Û dijîn em pismamtî.

Casimê Celîl dêmekî lîtêratûra kurdaye sovêtyêye naskirîye.Efrandinêd wî bi zimanê cimetêd TRSS (Tifaqa Rêpûblîkêd Sovyêtîstana Sosyalîst-R.N.) û zimanêd cimetêd welatêd dereke hatine tercmekirinê.Ew ji sala 1936-a uzvê tifaqa nivîskarêd TRSS-ye. Sala 1954-a tevî qurilta nivîskarêd TRSS bûye Lê du sala şûnda tevî dehrojya îskûstva û lîtêratûra ermenîyaye li Moskvaê bûye û hema vê salê jî bi medala "Bona başbûna xebatê"-va hatye rewakirinê.Ewî usa jî layîqî hurmetnama Sedirtya Sovêta RSS Ermenîstanêye tewrebilind bûye.

Casimê Celîl û neferêd mala wî usa jî şuxulekî milethizyêyî mezin dikin di dereca berevkirin û ji undabûnê xilazkirina xezna meye miletyêye zar.

Li min pire niha hizret,
Kanîk xwera kirye zîaret,
Timê diçim ber wê kanîyê...

Şiêra xweye "Kanîda" şayîr ha nivîsîye. Ew kanî cimeta şayîre qedîmîye, ji kîjanê ewî av vexwarye û bi qelem û şuxulvanya xweva bi helalî qulixî wê dike.

# Rojê Min

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

LÊNÎNÊ MEZIN

Temamara kenya ro ji ezmana,
Nûr û şemal da mîna şemdana,
Ew tuî tu mîna roê,
Te şemala xwe avît ser dinê.
    Dinê ne welidîye merîkî mîna te,
    Lênîn, Lênînê Mezin, tu kinêzê me.

Lênîn, te qewet hildaye ji roê,
Te ew bela kirye ser bendê dinê,
Lênîn te qewat hildaye ji bera,
Bela kirye dinê, daye her benda.
    Dinê ne welidîye merîkî mîna te,
    Lênîn, Lênînê Mezin, tu kinêzê me.

Te bi destê pola emrê kevn hûr kir,
Emrê teze, şemal li dinê geş kir,
Destê te pola qewat dan feqîra,
Qewata bêhesab, kûraya okîana.
    Dinê ne welidîye merîkî mîna te,
    Lênîn, Lênînê Mezin, tu kinêzê me.

Te da kurda şabûn û mal,
Te ew kir xayê keda wî helal,
Tu bûyî hub, edlayê dinê,
Tu bûyî çîayê Cûdê bona edlayê.
    Dinê ne welidîye merîkî mîna te,
    Lênîn, Lênînê Mezin, tu kinêzê me.

Institut kurde de Paris

## OKTYABİR

Mij û dûmanê hildabû dinê,
Zelûlî bibû ewrekî giran,
Dinya dientya bi kûr axînê,
Şînêda bû ro boy pale, gundîya.

Zerpa Avroraê meqes kirin erş
Û qelaşt perda zulma rû dinê,
Bengzê xwe xweş kir roja pence geş,
Oktyabrê azayî anî boy dinê.

Deya neçû emekê wan pale, gundîya,
Ku xûn rêtin bona roja îroyîn,
Bin teva geşda ewledê wan niha,
Aza, bextewar û xweşbext dijîn.

Bi keda helal, tifaqa biratîyê,
Dest dan destê hev miletê dinê,
Wan mina kirin çi kevn bû, bêkêr,
Çi ku boy wana nepak bû, bêxêr.

Oktyabrê azayî anî rû dinê,
Zerpa Avroraê şemal da dinê,
Efirî bi destê pale û gundîya,
Ev emrê me şa, Welatê Sovêtîyê.

Institut kurde de Paris

## XWELÎYA WETEN

Xwelîya weten tu kardarî,
Tu kanîyî, aminî, dê,
Ruh û canî, dur karbarî,
Xwelîya weten, aminî, dê.

Rengê awaz didî gula,
Emir didî çîa û banîa,
Dibî tu misk, dibî mawer,
Dayka amin, em te bawer.

Zevîyê genim tu dighînî,
Tu gumanê didî dinê,
Tu xudanê eşq û şayê,
Xwelîya weten, aminî,dê.

Tu kanîya emrî, xwelî,
Emir didî tu ewleda,
Bi huba xwe tu vedikî,
Li pêşîya me hemû derga.

Institut Kurde de Paris

Roja şemal bengîye ser te,
Bi nûra xwe radmûse,
Gul û sosin dibişkivin,
Mêr dibin xal binçena te.

Xwelîya weten, ji te dertê,
Cew û çemêd avqudretî,
Û pêl dide li her dera,
Qinyat, şîre, boy lawê tî.

Medenê zêr, zîv û qîmet,
Qurnada te berev kirîye,
Ew kitêbe, wa bi hisret,
Ber ewleda te vekirîye.

Xwelîya weten, tu kardarî,
Tu kanîyî, aminî, dê,
Ruhî, canî, dur, karbarî,
Xwelîya weten, aminî, dê.

Institut kurde de Paris

## WETEN DÊYÎ

Weten dêyî, te hizdikim,
Te hizdikim bêhesab,
Weten royî, ez gul didim,
Rengê qumaş û zerbab.

Tu kanîke avsar, zelal,
Tî şewitîm bona te,
Te şîr da min, dayka delal,
Çawa nestrêm huba te ?

Institut kurde de Paris

## LI BIN TEVA İROİN

Fikir min dibine dûr,
Welat û yêrêd nenas,
Fikir min dibine dûr,
Berbi berê bêqeyas.

Car din fikir min dibin,
Bi dorgera ber erşa,
Li ser hîva zerîn,
Nasya xwe didim benda.

Tevî hezar benda,
Bi fikira dibime nas,
Wexta şer bîr tînim
Cîda dibime risas.

Ne ev dinya şaneşîn,
Gund û bajarêd zengîn,
Ne ew ulm û zanetî,
Tev ji benda xuliqî ?

Çima bende boy benda
Bibe dijmin û debe ?
Boy xûnxur û şerxwaza,
Dibe tenge ev dinya ?

Şerhiz mîna debê har,
Qetl û xûnê dikin kar,
Li bin teva îroîn,
Wê hemêz kin axa sar.

Institut kurde de Paris

## HERGAV, ÇAXÊ KU BAHAR TÊ

Hergav, çaxê ku bahar tê,
Û gul didin gulê deşta,
Li wê demê bîra min tê,
Rev û bezê me li besta.

Eme biçûk, bê dê û bav,
Bê xûşk, bira û bê pismam,
Pêxas tezî ser meda saw,
Ha direvyan,nizam kuda.

Me hiştibû gundê xwe şên,
Çemek zelal têda dikşya,
Me hiştibû zevîyê hêşîn,
Ku wê teze ekin bidan.

Me hiştibû çîaê bilind,
Ku bona gund bibûn piştmêr,
Û wê hênê ewe bêçar,
Serê xwe jî kirin berjêr.

Girya tebyet wê baharê,
Hêsirê gir hatin xarê,
Girya tebyet wê êvarê,
Ku me girtibû rîya revê.

Institut kurde de Paris

Hergav,çaxê ku bahar tê,
Û gul didin gulê deşta,
Li wê demê bîra min tê,
Rev û bezê me li besta.

Rojêd giran buhurîne,
Ew bona me bûne xewn,
Lê gundê me niha wêran,
Timê, timê bîra mine.

Dorberê xwe dinhêrim ez,
Li vê roja baharê xweş,
Sor û spî, sût û gevez,
Dixemilînin kewşen û deşt.

Dewsa dengê top û gulla,
Deng, gurînya maşîna tê,
Yêd ku şev-ro xebat dikin,
Bona gund û bajarê şên.

Institut kurde de Paris

Dewsa girîyê, û kêwirzê,
Dewsa qîrîn, rev û bezê,
Tê bihîstin dengê zurnê,
Dengê kilam û stranê.

Berê gundê çûk û tazî,
Ku xwe dabûn pêsîra çîê,
Qincilîbûn ji derd-kula,
Nedibûne qe lenekê.

Niha binhêr gundê me şên,
Çawa xwera gul vedane,
Ji tam-taşê wê tê kivşê,
Wekî niha xweş zemane.

Ez dinhêrim cahilê me,
Û şa dibe, dilê min şa,
Vê bahara meye rengîn,
Cahil mera bûne bahar.

Institut kurde de Paris

BİRANİN

Ewravî bû, ezman reş dikir,
Yek-yek stêra xuya dikir,
Qey te digo çevin tên xuyan,
Unda dibû pij ewra li ezman.

Çiqa bîranîn ji rojê buhurî:
Tîbûn, birçîbûn û çevê girî,
Û nexweşîya çetine bedhal,
Nav ezmanda me kirye çel.

Li çîême, şeve, rûniştîme,
Li ezmanê hêşîn dinhêrim,
Emrê buhurî û zarotîya xwe,
Rojê xwe çetin niha bîr tînim.

Hebûm deh salî, êtîm û bêmal,
Ji birçîbûna min xirav bû hal,
Ewr û ezmana min ku dinhêrî,
Min tirê, minra ezman jî digrî.

Mira bû heval kurkî ermenî,
Ew jî mîna min êtîm, bêxwayî,
Ber dîwara diketin xewê,
Bê star bûn him roj, him şevê.

Em hevra bibûn sî-star,
Loqê nan me bêy hev ne dixwar,
Siba em diçûne nava bazarê,
Bê risq nediman em wê derê.

Institut kurde de Paris

Êvar bû îdî, em herdu jî birçî,
Erebeke gundîya hat û sekinî,
Barê erebê tije zeveş bûn,
Ez û Sakova berbirî wê çûn.

Min go: "Apo zeveşkî bidî ?
Em herdu vêspêda birçîne, birçî."
Xayê erebê paşda zivirî,
Du qamçî namila min jimirî.

Min kire qîrîn û revîm,
Îdî paşda ne zivirîm,
Wexta êpêce bazarê dûrketim,
Ber dîwarekî sekinîm.

Min dî Seko hat gihîşte mal,
Go: "Bira, merî çiqa bêremin,
Ji derpa qamçî dişewitî,
Û werimî bû namila min."

Rex min rûniştî Sako digrya,
"Tişt nake, wê derbaz be bira".
Min wî nihêrî, hêsir çevada,
Me hev hemêz kir mîna du bira.

Wê şevê em ber dîwarekî,
Rûniştin, me xeberda hinkî,
Nalînê min bûn ji ber êşê,
Nizanim çawa ez ketim xewê.

Institut kurde de Paris

Ez ku hişyar bûm, min xwe nihêrî,
Sako pişta xwe daye pişta min,
Kiras êxistye, avîtye ser min,
Ez wê rojê nikarim bîrkim.

Ez, Sako hevra em bûne bira,
Dilê meda hezar nêt merem,
Wede buhurî, me rojê xweş dî,
Bûne xweyî ked, êtîmê birçî.

Institut kurde de Paris

## JI ROJÊ BUHURÎ

Birê min mezin çarde salî bû,
Best û kewşenê gund ew beled bû,
Diçûn ber berxa carna tevayî,
Firîk çêdikir genimê gihîştî,
Carna me çolê hesp digirtin,
Lê sîar dibûn diketin qoşê.

Pey xoşyêra hatin rojê çetin,
Ser meda heş bûn rojêd zarotyê,
Herbêda bûn em bi şev, bi rojê,
Saw bû ser me, em qûlê xofê,
Guhê me bû ser hewar û gazîyê,
Hicûm dikirin gund eskerê Romê,
Mal û hebûn talan dibirin,
Hicûmê wan bûn: kuştin û mirin.
Rokê gundîyê me ya xwe kirin yek,
Qirar kirin ber Romê bikin şer,
Kom kivş kirin wana bi serek
Dora gund hesar kirin kere-ker
Bavê min jî tivingek hilda
Çû li tabîya fêza gundê me,
Wê şevê dijmin ser gundda girt,
Vê carê kapê wana nehate çivt,
Bêxof dihatin teqala rêda,
Ser wanda barî teyroka gulla,
Hetanî sî merî wan hate girê,
Paşda revîn yê dûr bûn mezîla gullê.

Institut kurde de Paris

Dijmin ku revîn, deng seqirîn
Gundîyê me tabyada berk sekinîn.
Sibe ku ron bû bavê min hat mal,
Qelûna wî dikşya dûkî zelal,
Sîlih danî, xubar xwe dawşand
Ser kulav rûnişt bîna xwe kişand,
Zivirî li neferê malê nihêrî.
Birê minî mezin wî malda nedî,
Dîa minra go: "Ka Baso, kuye ?
Vêspê şebeqê ew kuda çûye ?"
Dîa min go: "Êvarda nehatye,
Dibe mala apê xweda razaye".
Wê demê derê me hêdî vebû,
Baso sekinî, reng lê çûbû,
Ser piştê patrontaş hebû,
Tivingek milda darda bû,
Bavê min wa ji Baso pirsî:
"Ew çi tivinge ? İşev tu ku bûyî ?"
Baso hat gihîşt orta malê,
Tirtilî, xwe sparte stûnê,
Namil sor bibû ji ber xûnê.
"Kurê min birîndare",-bû qûjîna dê.
Bavê min sekinî Baso dinhêrî,
Dîa min çû wê melhem anî,
Birîna Baso wana girêda.

Institut kurde de Paris

Bavê min enya Baso ramûsa,
Go: "Tu tevî kîjan komê bûyî ?
Yan hema serê xwe,tenê çûbûyî".
- Cem apê xwe bûm, devê rê,
Rom wexta ji ber me revî,
Para li min xist, birîndarkî ketî".
Bavê min ker bû, dor xwe nihêrî,
Go: "Ber xwe nekeve, şikir mezinî,
Mêrê ku îdî sîlih hilda,
Wê taymîşde ber birînê gulla".

Çendek buhurî birînê kew girt,
Baso dîsa silha xwe hilgirt,
Lê mîna berê tev me nedilîst.
Carna ku Baso bal me rûnişta,
Wî timê pesnê wî şerî dida,
Û ber me zara, çawa şedetî,
Namil vedikir - birîn îzbatî.

Institut kurde de Paris

EZİ CAHILIM

Carna digerim ez soqaq-soqaq,
Êvarê dereng vedigerim têm mal,
Vedigerim hêdî, westyaî gelek,
Û hêsa dibim ez bin banê xwe.

Heval û hogir dicivin tên mal,
Em xeber didin şîrin, hemdê xwe
Em pirsa didin, heneka dikin,
Û mira dibên: "Kal bûyî diha".

"Kal bûyî diha", -dibên ew xorta,
Şêst û pênc salî tu heyî diha,
Binhêr, wê mûê spî ketine,
Dora cênîka, nava porê te.

Ewana dibên, xwera şadibin
Û carna nazik ew min def didin,
Û bi pîrqe-pîrq dikenin ewan,
Ez jî wanara hilbet şadibim.

Carna dikevim ez nav mitala,
Û difikirim, gelo rast dibên ?
Ku ez kal bûme, yan kal dibim diha,
Ku porê spî şedetîyê didin.

Ku qewat diha kêm dibe çoka,
İşiq çevada wê ditemire,
Û zerpê dil jî mînanî berê,
Diha lênaxin qefesa mida.

Institut kurde de Paris

Na, hilbet ew yeka heneke, henek,
Ezî cahilim mîna xortê han,
Mînanî berê hê gelek, gelek,
Ezê bigerim gund û şehera.

Ezî cahilim, qewat li milda,
Qewat li çoka û qewat dilda,
Ezî cahilim nav xabatêda,
İşiq çevada, qewat qelemda.

Binhêrin, çawa rojê ku çûne,
Ji roja îroyîn diha cudane,
Binhêrin, çawa ji rojê çûyî,
Roja îroyîn bilind xuyane.

İro vir çîaye, kevir û kuçike,
Sibê sîngê çîê diqelişînin,
Û çemê avê lawêd me cahil,
Sîngê wî çîaêva wê derbaz bikin.

İro vira xwelî şore û xopan,
Şîn nabe vira qe simlek genim,
Lê sibê vira xwelîyê kardarbe,
Û gund û bajar, dorber şên bibe.

Duh li vî erdî tarî - tarîstan,
Şivêta îsên ne dihat xuyan,
Lê binhêr îro çiqas pir cahil,
Top bûne vira û dikin xebat.

Institut kurde de Paris

İro qal dibe dorgera dinê,
Kubar û egît dora dinyaê,
Ser sîngê wêye steyra Sovêtîê,
Ku çêkirine aminê welêt.

Dixwazim bêjim hevalê xwera,
Hogirê xwera, pismamê xwera,
Ezî cahilim mîna rojêd me,
Ku emrê teze her sehet tîne.

Ezî cahilim qewat li milda,
Qewat li çoka, qewat li dilda,
Ezî cahilim nav xabatêda,
İşiq çevada, qewat qelemda.

1973

Institut kurde de Paris

x x x

Ez hiz dikim bahara bîn,
Deşt - zozanê meye pir şîn,
Ku dihelin berfêd çîa,
Cew dixulxulin ji belekîya,
Kanîê zelal dikşin hêdî,
Ew pêl didin bê xem, xîyal.
Tirê ew jî bûne rêwî,
Û wa dikşin rehet, hersal.
Ji bin berfê bi şerm, fedî,
Hişyar dibin kulîlkêd kaw,
Bejin dikşînin û gul didin,
Bê tirs û xof, bê xem û saw.
Vê baharê helya hemû,
Hemû berfa li serê çîa,
Dinya spî bedew reng bû,
Xweş xemiland xwe bi gulîya...
Li cênîkê xwe dinhêrim,
Ewe dîsa spî mane,
Û bahara tebîata min,
Berfa spî ser min barand.

Institut kurde de Paris

## DILÊ BENGÎ

Carna tu ji min dipirsî:
"Tu çima, tu çima kal nabî ?
Tu çima mînanî hevala
Darekî li destê xwe nagrî ?"
Carna tu ji min dipirsî:
"Çima porê te hê reşin,
Çima mînanî hevala
Ew ne çîl û qerqaşin ?"
Carna tu ji min dipirsî:
"Tu çima mînanî hineka,
Heta îro kûz nabî ?
Na axir paîza emrê te
Wê li pişta çîaê han tê xuyan".
Belê,hevalo, tu rastî,
Paîza emrê min tê xuyan,
Lê tu gotî bizanbî,
Dilê min kanînge nav reza
Şa dibim bi dil miraza,
Şa dibim bi ber û reza,
Ku vê paîza emrê xwe
Min çandye ji darê baxê xwe.

Çawa dikarim ez kalbim ?
Ne axir paîza han ku tê,
Wê bive gulana emrê min.

Institut kurde de Paris

TÊ BÎRA MIN

Tê bîra min rojêd neşa,
Rojêd giran û zelûl,
Cimet koçer dil neşa
Çevê hêsir û melûl.

Kê wê bida misken, şeher,
Gazêt, kitêb û xwendin,
Kê bida xwelî û war,
Cimetê koçer ku şabin.

Komekdarîya Rûsya Mezin,
Û cimetê biratî,
Xweyê xwelîyê îro emin,
Û dijîn em pizmamtî.

Îro heye kitêb, gazêt,
Bona miletê biçûk,
Û cimeta kurd jî aza,
Bûye xweyê bext-miraza.

Institut kurde de Paris

BİRANİN

Sibeye, ji xewê ez hişyar bûme,
Kubreke şîrin dibhêm, bend bûme,
Ji Adrbêcanê distirê Byûlbyûl,
Kilamê evîntîyê, kilamê huba dil.

Bîr tînim ez Şerê Weteniyê,
Binya Lênîngradê em ketin tabîyê,
Dihat xirmîna top û gulla,
Bi gujîn dikşîyan refêd firinda.

Xortekî tûre tabîya rex mida,
Bi tenzîva spî milê xwe dipêça
Ji brîna milê wî xûn diniqitî
Wî gazî min kir zmanê ûrisî:

-Ez birîndarim ji zenda rastê,
Dibinî, dijmin ji tebîya dertê,
Tu min nenhêre, şerke egîtî,
Dibinî dijmin wê paşda revî.

Institut Kurde de Paris

Min destê xwe da ser tetka topê,
Nav hewêda gulle ketine rêzê,
Bû xirmîn, qîrçîn û hesin barî,
Hey min dinhêrî wî birîndarî.

Bi gulleke din jî bûbû birîndar,
Xûn dikşya ser enya kever,
Ne dikir axîn, ne jî zarezar,
Kubra Adrbêcan min bû dîhar.

Bedhal bû, distra xortê birîndar,
Kilama evîntîyê huba bê zewal,
Û ew kilama wî baş tê bîra min,
Ji Adrbêcanê tim distrê Byûlbyûl.

Institut kurde de Paris

## ŞEMDANÊ YÊRÊVANÊ

Yêrêvana min - geş bajar,
Şemdanê te wê bûne ber,
Çirûsya çirê Êrêbûnîyê,
Bûne bîranîn,
Bûne member.

Şemdan hene ji Êrêbûnîyê,
Ji wan roja heta niha,
Hê dişxulin, nûr şemdanin,
Ser rya silsileta bûne çira.
Ew şemdan û ew çira,
Bûne şedê pirsê alav,
Keda helal, fikr û sewda,
Aqil, sirafetê ermenîya,
Bûne kelke tim altinda,
Li nav pêlê ber okyana,
Bûne pesn û eşqa dila.
Nûr dişxulin hê ew çira -
Tarîqin,
Wê tarîqbin bona nisla.

Institut kurde de Paris

Tacê nûre bona Yêrêvanê,
Matênadaran -
      Birca bi nav,
Qat-qat destxeted kevnar,
Belgêd zerbûyî -
      Bi toz û xubar,
Belgêd kubar -
      Bi xemlêd al,
Têlê fikrê, ruhê sadeh,
Nedîr - lê bûye xaz û xet.

Tîrinca nûr hev hûnayî,
Şemal û nûr lê bûye ro,
dijminê har, çevnebarra,
Bûye agirê dojeyî gur,
Şewitandine, xwe şewitîne,
Lê nûra wê,
      Bû dû, tenî,
      Alava gur,
      Mînanî dur,
Vê ocaxêda bûne destxet,
      Tarîqa kevn -
Mêrxasya hur,
      Cengêd cefa,
      Şemdana nûr.

Institut Kurde de Paris

Birc û serê Yêrêvanê,
    Bîranînin,
    Hizret û nav,
    Şemdanê ulmin.

Tim altindar - ew heçêd miqermin,
Tifiqîne ji dilê ermenîya,
    Bi destê mazol, dilê nazik,
Kûra agirda emir xarangî kirne,
    "Ermenîstana dê"
Kubar dane ser dikê
Şûrê destda, ro namilê,
Eşqe demê wêyî bi rem,
Rehetya me ew xwey dike,
Ji ser dikê, altindarî.
Mîna alavê rikêv dike,
Cenya hêrse - Celalî,
Agir dertê ji firnê wê,
Lê Davîtê mal Sasûnî,
Şûrê birûskêî erş qelêş,
    Ku berjêr ke,
    Wey li kêxe.

Herro berî êvara -
    Pencê roêye geş xwedikin,
Stûnê Sîsêrnakabêrdêye bilind.

Institut kurde de Paris

Ew bîranînêd hezarane,
Yê hizreta emr û roê mane,
Ew bîranîn - agirê netemirî,
Dişxule bi şev û roê,
Boy şehîdê bêsuc, gune.
Nefesa wan ew agire,
Ji bin xwelîyê, dilê xwelîyê,
Bûye hêlepîtk û dide der.
Her birc serek Yêrêvanê
Ew emreke,
Tarîqa silsileta,
Mêrxasîne - bûne heykel.
Nav şemdanê Yêrêvanê
Kevirêd wê şemal hiz dikim.
Kevir - ji ronaya nûr û alav,
Reng guhastye û sor bûye,
Ji sorayê - cara betreng bûye,
Lê ku dinhêrî sîngê birca,
Qey dibêjî roye derketye.
Ronaya fikra taraq bûye,
Bi xemil ew nitirîne.
Guşîyê tirîya,
Belgê fire,
Bi hinar, kulîlkava...

Institut kurde de Paris

Ji qurna hatine
Gihîştine,
Bircêd zîaretî,
Kumeytêd nexş tertîbkirî,
Mîna cenga emir,
Şedê bi nûr,
Bûne temaşegeh,
Ji xwelîya şewitî:
Êrêbûnî, Arînbêrd
Û Karmîr blûr.

Ji teva Yêrêvanê -
Nedîra narîn yeko - yeko çinîye,
Kirye baqa ji bahara rengîn,
Û sifetê xweş,
Tebyeta nexş,
Ser kitana cîwar kirye,
Ostayê nûra roêî geş,
Martîsos Saryanê destber.
Kîjan sera sifeta,
Ku tu derî lê vekî
Nûra roja Saryan
Tuê têda bikî.
Xwelîya qimitî, betreng,
Erê reş selam nakin.
Ji çîaêd me bilind,
Nedîra roja geş,
Bi guman me dikenin.

Institut kurde de Paris

Ji şemalêd Yêrêvanê
Ez kîjanî bêjim,
Ji roê qewat standine.
Ro bûye gumana
Riat û rêncberê ermenî,
Qinyatê bera erşa.
Wê berêda steyrkin bê hesav.
Ez ezmanê Yêrêvanêî
    Nûr û şemal pir hiz dikim -
    Ku hêşîne, ker û edil
    Ro dikene bi dêmê geş.
Bin nûra wêda berêda bêmal
Dûmeqeskê hêlûn hûnaye,
Şirdana qulingêd Komîtas,
Berbi mala xwe vegeryaye.
Erşê ronik hub diwelide,
Hub bi hubê gul-geş dibe,
Şemdanêd bratîyê
Ocaxa geş nûr dide.

Institut kurde de Paris

Lê ez - kurdim,
Bi zimanê xwe,
Bi erf - edet,
Nan - xwuyê xwe
Ez şemalê bratîyême,
Azayême,
Û nimûnim,
Boy birêd xwe,
Yêd ji min dûrin,
Cenga şêrda,
Şerkarin -
Boy azaya xwe.

Institut kurde de Paris

## TEV NEBÎYÊ XWE

Sibeke der baharê,
Roê silav da dinyaê,
Baê şayêyî nazik,
Hildam, lêvê min ramûsa:
"Îroda bûyî kalik".
Û hizreta min sala,
Mîna baskê teyreda,
Ji dilê min qetya,
Firîm berbi ezmana.
Peyabûm bi dilê şa,
Min xwast bikim gazî:
"Kalikim ez",
Dinê merîk zêde bû.
Ew ro min xwest kivşkim,
Ku baş bîr bînim,
Tu cara neê bîrkirin,
Min anî hewşa meda,
Çiqeke baxa daçikand,
"Bira şînbe, mezinbe,
Bibe dara nebîê min".
Bi dilê eşq av anî,
Avda çiqa min danî,
Derbaz bûn ro, meh û sal
Ew dar tevî nebîê min,
Ro-ro gul dan, mezin bûn.

Institut kurde de Paris

Baxê çiqda, xemilî,
Nebîê min gerya, xingirî,
Xeberda, ziman gerî,
Ez, nebîê xwe tevayî,
Paya dibin hewşa me,
Ew bi elba destê xwe,
Av dide wê baxa xwe,
Xalya dorê nerm dikim,
Çiqas jî westyaî bim,
Nebîêm destê min digre,
"Kalko,zanî niha,
Çiqas tîne baxê me".
Diçim darê av didim,
Ku dar rind hêşînbe,
Nebîê min jî darêra
Mezin dibe, gul dide,
Ro û meh derbaz dibin,
Bejnê dikşîne nebîê min,
Baxa wî hêşîn dibe,
Ew bax naha biçûk nîne,
Ji avayî bilindtire,
Nebî ji min dipirse:
"Kalko, te digo,
Bax mîna te biçûk bû,
Lê çima ew bilind bûye,
Lê ez hê kin mame ?"

Institut kurde de Paris

- Nebîê minî delal,
Bax zef te hiz dike,
Mezin dibe ji eşqa te,
Bilind dibe, çiq dide,
Wexta ku tu westîayî,
Bin sîa wêda rûnêyî,
Belgê wêyê hêşîn,
Tera kilama bêjin,
Û tu rind hêsabî,
Ji tevê eciz nebî.

Hero siba zû,
Ez û nebê xwe,
Peya dibin hewşê,
Av didin baxê,
Bira hevra mezinbin,
Nebîê min û baxa wî,
Her nebîk baxke hêşîn,
Guldin û eşq mezinbin,
Qewatbin ser xwelîê,
Mîna baxa mehkem bin,
Û rehê wan penc vedin.

1968

Institut kurde de Paris

## XANÎÊ ME

Xanîê me kevne û rinde,
Bi kevirê sor çarqat, bilinde,
Xanîê wa dorberê me,
Berê zef kêm hebûne,
Li wan şevê hewa nerm û xweş
Li wan şevê hîveran û nexş,
Min dil dikir steyrkê ezmana,
Jorda banya xar.
Ew xanmanê dorê,
Jorda çûk dihatne xanê,
Ser banê xanya
Gîha dibû telp,
Û carna pelewan dihate bal me,
Ku bona zara, bona me hemya,
Banzde bilîze,
Mîna şêr, piling,
Û kosegeldî,
Yekî rûdirêj,
Dida dû zara
Lê dikenyan qîz û bûk,
Derbaz bû wede.
Û hêdî - hêdî,
Û bere - bere,
Kes têda nema,
Xirav kirin ew xanman...

Institut kurde de Paris

Dewsa wan banê biçûk û hûr,
Ê teze wir rabûn, bilind bûn dûr.
Û niha,ku ez dinêrim li jor,
Teze zanim, ku ew xanmana
Çiqas biçûke ber xanîê teze.
Lê ew qanûn û ew xastina
Destê tu kesî nîne.
Ay, du min digirt destê kurê xwe,
Lê îro, kurê wî digre destê min,
Digre destê min, min digerîne,
Mîna zarekî ezim ber biçûk.

Institut kurde de Paris

## XAZİL Lİ TE

Xazil li te, ewledê min,
Bi dil xazlê te tînim,
Xazil li te, ewledê min,
Rojê ku bên, ez dibînim.

Ez dibînim bi nêt û fikra,
Tuê bibînî li ber çeva,
Dibe ku tu jî herî mêvan,
Li ser hîvê, ha, hîva han.

Emrê wira xewne niha,
Wir hêwr dîtye fikrê benda,
Heta bivî xortekî tûre,
Ulmê wira birca çêke.

Institut kurde de Paris

## CEMİLA MINRA

Cemîle, tu rindikî,
Mîna kewa edlayê,
Cemîle, tu nazikî,
Mîna pencê roê.

Bilind bistrê, Cemîle,
Sed û kubir, dengê te,
Li bal bilbila tune,
Qîza delal, Cemîle.

Bira baê xweş bive,
Herçar qulba belake,
Kilama şa, edlayê,
Bira her bende bibhê.

Tu dengê xwe qîza min,
Bigihîn dorgera dinê,
Bira hîva ji me dûr,
Ew jî seda te bihê.

Kilamêd teye kurdî
Bira bi per û bask bin,
Bigirin pêşîya xiravyê,
Bibin kewa edlayê.

Institut kurde de Paris

WEDE

"Wede" - ew xebereke tenê,
Tu bêjî sadeye, rast bi rast,
Didî xebatê hêsa,
Her cî, her wext,
Qey te tirê hema ûsa.
Hukumî ser her cî dike,
Batinî, lê eseye,
Eyan dibe vir, ku bîr dikin,
Dide wan cizaret.

Em bêjin merya bîr kirye,
Zevya gihîştî biçinin,
Wede kelo-bîn tê, wî çaxî,
Simlê genim tev dadiwerîne,
Idî bêfeydeye axîn,
Merî ser hemdê xwe tên,
Dibêjin: "Wede bihurîye !"

Heger xebathizî, tim şuxulda gîro,
Wede tera hevale, piştovan,
Tu jî nizanî, wede çawa derbaz dibe,
Dibêjî: "Wede tune îro !"

Institut kurde de Paris

Wede meryara gumana mezine
Û axirya xêr,
Bende gumana xwe wê girêdidin,
Vir tune sêr.
Wexta pirs dikî: "Kêyî û kengê ?"
Dibêjin: "Tuê bibînî, ku wede bê !"

Sureke wî wedeyî heye
Bîrkirinê ew hiz nake
Bêxîretara dibê: "Wede sebir nake !"

Wede berke û xwastin pir,
Hiz dike dîhar be wir, ku hîvyê nînin,
Çaxê îxtyar dibî, çok dide ser te,
Ji te dixwaze hesabê kirinê te,
Û tu dibêjî: "Erê. Wedeye".

Institut kurde de Paris

x x x

Kê dikare steyrka ezmana bîne xar,
Yan derxûnke berêd dinêye pêlhar,
Yan jî hemêzke çîaê bilinde qihar,
Bike zivistan, wexta bahare,bahar.
Sal rêz bûne, kişyane mîna cew-kanîya,
Bûne dewr, qurne, çemkî ketine bera,
Ji wan bera şayîr qinyat hiltînin,
Ew bi kilamê edlayê ezman tijî dikin,
Dêwêd har, hûtêd, ku dijîn bi xûnê,
Mîna berfê wê unda bin ji rû dinê.

Institut kurde de Paris

SALA TEZE

Gund û şeher, çîa û banî,
Berfa spî wa nerm danî,
Der û derge tev xemilî,
Nolî çirê ro şuxulî.

Tev ji sermê tirsîya, çûk bû,
Ew bona me topek nûr bû,
Lê emrê me teveke geşe,
Bona gişka başe, xweşe.

Zivistane, sur û serma,
Derva tijî meriv bûne,
Verê dikin em sala kevn,
Ew bona me nebûye xewn.

Me dest anî him edlayî,
Bextewarî li rû dinê,
Me dest anî him biratî,
Him pizmamtî nava dinê.

Vekin derî, bidin bê,
Sala teze va teze tê,
Sala teze bimbarek bê,
Bi hebûn bê, edlayî bê.

Institut kurde de Paris

GURCİSTANÊRA

Ez gele cara te bûme mêvan,
Geryame li her gund û bajara,
Tu xemilekî bi çem û ava,
Gurcistana gul, aza, bextewar.

Çîaê kazbêkê, ku min dinhêrî,
Ew dibirqî bi şewqa roê,
Avê belekîya mîna kemberê,
Xemilandibûn bejn û bala wê.

Teva alavî mîna dayka wê,
Wê penc vedabû li serê çîê,
Û bi pencê xwe îşiq û zerîn,
Eynî tacek bû, tacekî zerîn.

Nîvê çolê wê temam mêşene,
Temam bi darê rez û tirîne,
Hezar terewul û bilbil lêne,
Gundê teye şên kaw nitirîne.

Bûme mêvanê Kaxêta rengîn,
Wir çinîye gulê bi hezar rengî,
Ez bi tebîyetê mame hizkirî,
Û bi dilê eşq lê bûme bengî.

Wextê gundada ez bûme mêvan,
Gele razî mam ji hurmeta wan,
Tev merivhizin û dilê fire,
Ez hesabkirim ji pismamê xwe.

Institut kurde de Paris

Çemê Rîonê û Elezanê,
Tim dixulxulin bi terzê saza,
Û ji têlêd xwe ronkayê didin,
Ronkaya alav boy hemû dila.

Yêr û erdê te ber çevê mine,
Mîna emenîya bi hezar nexşî,
Qey tu dibêjî şikilkêşeke
Tev neqişandîye bi hezar terzî.

Ez bi ken û eşq ji Kûdîgorê
Rojekê xwera jê berjêr bûme,
Min dîye li ser rîya Sîsamûrê,
Heykelê Îlîya kubar sekinîye.

Îlîya bilbilê bi kubra xweş bû,
Gele meşîyabû gulistana te,
Sewta kilamê wî hê tê bihîstin,
Ji gul-sosinê war, miskenê te.

Va sekinîme Fûnîklyorê,
Û bakî sivik dike şingeşing,
Û ji zavodê dû dikşe jorê,
Ew xwera tîne kilama eşqê.

Ez peya dibim ji wî hevrazî,
Ro qulibîye li roavaê,
Û soqaqê te fire ronayî,
Bi dil lêdikim seyrangê.

Institut kurde de Paris

Hezar û yek terz qîz û bûkê tene,
Bi bejn û balin, ew teylan keleş,
Xwe dimeşînin kubar û nazik,
Ez bend bûme û mame mohtac.

Ji her soqaqa dengê qîza tê,
Dengê kilamê saz û çongûra,
Pismamê min tev eşq, şane,
Wan xemil dane gund û bajara.

Ew çêdikin tamêd seranser,
Ji kevirê tûf, granît, mermer,
Gurcistana kaw aza, bextewar,
Mîna şeva steyrkê ezman,
Lê diçûrisin bêhesav şemdan.
Ez gele cara te bûme mêvan,
Geryame li her gund û bajar,
Tu dewlemendî bi çem û ava,
Gurcistana kaw, aza, bextewar.
Tblîsî - 1954

Institut kurde de Paris

## XEBERA DAYKA ŞÎRALÎ

(Qewmandinek ji sala 1920-î)

1

Ezê gilîkim serhatîke kin,
Ku heta niha naçe ji bîra min,
Ew deqa giran çiqas bîr tînim,
Kulfeta kurmanc tê ber çevê min,
Tê ber çevê min xeysetê xweva,
Bi hub, hizkirin ber bi wetenê me.

2

Rojekê rabû dayka Şîralî,
Ji xewa şîrin, xewa hingorî,
Nivînê rexda kurê xwe nedî,
Dît derê odê ser piştê danî,
Û pencê tevê bi awaz-awazî,
Ser cî-nivîna xwe dabûn perwaz,
Şewqa tîrêncê diket ser stêr,
Û dayka pîrra dihat bîna şêr,
Şikeke giran hingavt mîna tîr,
Dilê wê dayka Şîralîêye pîr,
Ew derba giran mînanî kevir,
Dil-hinavê dê diha hûrxwaşkir.

Ew çi ecêbe ? Kanê Şîralî ?
Ew kurê minî ezîz xweykirî.
Dibe bi şuxul çûye ber dêrî,
Şuxulekîva bûye mijûlî.

Institut kurde de Paris

Dayka Şîralî bi pê gere-ger,
Derket ber dêrî dît ecebeke wa,
Temam dibezin, diçin alîkî,
Di destê xweda çek sîlih girtî.

Çevê wan xûn bû, hêrs li çevê wan,
Ji dêmê qemer pirîsk dipekyan,
Û ji gullê wan, dûman radibû,
Dinya ronayî lê unda bibû.

Dayîk eceb ma. Ew jêra xewn bû,
Nav hevtê sala hê nedîtibû,
Wekî gundîyê wan çek û sîlih hildin
Û ber bi xweyê xwe pir gulla berdin.

Na, ew xewn nîbû, xewna îşev dîbû,
Xewnê usaye giran û ecêb,
Ber çevê daê beta vebûn
Mînanî horîê zîareta hecê.

-Lawê min şîrin, hûn kuda diçin,
Hûn ha çi dikin, çira şer dikin ?
Kanê Şîralî - kurê minî şîrin,
Xudanê dêye, karxezala min.

De bêjin lao, çi hal hewale,
Ne dinya ker bû çend sale.
Eva çi ecêbe, axirî xêrbe,
Ku wa barana gulla dibare.

Institut kurde de Paris

Cînar û gundî ku bibûn tofan,
Û dikşyan diçûn berî, berîstan,
Mînanî ewra wan kirin gazî,
Û ji dengê wan dinya lerizî.

-Daykê, bibaxşîn, wedê me tune,
Wedê me tune, eme pir lezin,
Wextekî şûnda dinya wê şênbe,
Emrekî teze wê mera çêbe.

Şîralîê te niha tev meye,
Kurekî aqil û merîfete,
Bona Şîralî duşurmîş nebe,
Ew sereskere, pêşîêda diçe.

3

Derbaz bûn pey hev paîz û gulan,
Derbaz bûn firîn mîna teyrê han,
Dayik hîvyê ma, hîvya kurê xwe,
Lê kurê ezîz nehat bal dîya xwe.

4

Rojekê rabû dayka Şîralî
Dît beyraqa sor ser xanîya nikandî,
Dayik şaş mabû, ker û gêj bibû,
Ew devdevî hevtê salî bû,
Lê ecêbê wa hê nedîtibû,
Beremberî mêra jin jî rabibûn.

Institut kurde de Paris

Daêra gotin, ku sovêt hatye,
Û ji ortê beg dane hildanê,
Ku qe nevînin tucar xelayê,
Cimeta rêncber, feqîrê hanê.

Dayîkê nihêrî û bawer nekir,
Got: - de, cahilin, laqirdya dikin,
Şêx û Şîxadî komeka wanbin,
Emrê xuliqî nabe guhastin.

Guhastin çiye, emir tev yeke,
Emrê îsanet awa çêbûye:
Yek wê beg be, û yek jî pale,
Keda mêrêd me helalî wane.

5

Derbaz bûn pey hev rojêd sovêtîyê,
Rojê sovêtîyê bîn dan ber pîrê,
Bîn dan û pîrê cahil bû tirê,
Çaxê emrê xweş îjar dî ewê.

Gundê kurdan guhastin ketê,
Serkarê gund bûn batrakê berê,
Bi çevê şîrin gundîya dinhêrîn,
Û firqî ji ortê dane hildanê.

Niha firêqet digeryan deştê,
Şivan, gavanê gundê wane berê,
Niha ji mêşe dar danî bi ereba,
Û ew nediketin tucar ser zara.

Institut kurde de Paris

Dar anîn wana otax çêdikirin,
Û halê xwe wana xweş kirin,
Niha prîstav tune li gunda,
Ku tim bikute xebatçîya, gundîya.

Bîra wê dihat, zivistaneke,
Bona qoltixek darê çinarê,
Birin ber sûdê kurê Gulnazê,
Girtin, avîtine zindana hasê.

Cînarekî wan hebû zef zûda
Digotin wekî bajêrda maye,
Niha hatibû û gundda dima,
Û bona gundîya çêkir komûna.

Hertim bi pîya gundda digerya,
Xwelî çap dikir û dida gundîya,
Tim civat dikir bona rêncbera,
Û ji kara wana ewî xeberdida.

Pîrê pak didît, ku ber çevê wê,
Emrekî teze dihat çêkirin,
Û rastî niha jîîn hêsa bû,
Ne ku dewrana ku derbaz bibû.

Institut kurde de Paris

Ew gişk zef pak bû, bextewarî bû,
Lê ka şîralî hê ne hatibû,
Ew yek dayikê pir dilêşîbû,
Carna rûdinişt pîrê ber dêrî,
Û xeberê han bîra xwe danî:
"Daykê bibaxşîn, wedê me tune,
Wedê me tune, eme pir lezin,
Wextekî şûnda dinya wê şînbe,
Emrê teze wê bê çêkirin.

Bona Şîralî duşurmîş nebe,
Ew sereskere, pêşîêda diçe".
Û çevê daykê hertim hêsir bû,
Ji dîndara kur hê têr nebibû.

6

Rokê daê çû bal merîêd mezin,
Go:-Selam,lao.
Gotin:-Ser çeva.
Go:-Bextê weme, nizanin gelo,
Li kuda çûye Şîralîê min.
Eva çend sale naê bîra min.
Berbanga sibê ji mal derketîye,
Û heta niha ew hê ne hatîye.
Ca bextê weme, ji minra bêjin,
Ezê kaxezekî wîra bişînim.

Institut kurde de Paris

Xeberê usa ezê kaxez kim,
Heta - hetaê neê bîrkirin,
Ca bira bê gund, bira bivîne,
Ku çawa dijîn rêncberê hana
Bira hê zû bê, xwelîyê jî hilde,
Û çi dixweze wê lê bavêje.
Diha dêst nagrin, diha nakutin,
Gundda dibêjin tev bolşêvîkin.

Lezekî ker ma pîra dayka han,
Dîsa xeber da tev mezinê wan:
-De wekî naê, xwedê pêra be,
Bêjin dayka te temînek daye,
Gotye, ku kuda dixwezî here,
Boy emrê teze xwe helal xweyke,
Helal bixebite, helal jî bixwe,
Helalî tîne emrê bextewar.
Eve nêta min, kurê min delal,
Eve nêta min, nêta min zelal.

-Kîye Şîralî, - pirsîn wê demê,
Xortê wî navî em nasnakin hê.
-Ew kurê mine, ew taê tenê,
Ronaya mine, bext û emrê min,
Wey, heme ewe, ewe şiklê wî,
Ewe ku heye, xwe bi Şîralî.

Wa kire gazî dayka keser lê,
Bi beşerxweş bezî berb dîwêr.

Institut kurde de Paris

Mezinê nehîyê daykê nihêrî,
Nihêrî melûl li şiklê dîwêr
Hêsir tije bûn çeva wê demê,
Serê xwe berjêr kir û gote daykê,
-Daê, kurê te eynî mêrxas bû,
Me ew nas dikir, çawa seresker,
Mezinê me bû Şîrinê komîsar,
Şîrin komîsar, delalyê esker,
Û wextê şerê ser Axbaranê,
Gullekî dijmin ew êxist erdê...

Dayka Şîralî ew yek nebihîst,
Dinhêrî şikil, şikil şa dibû,
Kur mezin bibû, simêl şîn bibûn,
Kincê eskerîê çiqas lê hatibû ?
Ax çiqas - çiqas dê keser mabû.

Careke mayîn mezin jêra got,
Ku komîsar bû kurê dayka pîr,
Ku wexta şerê ser Axbaranê,
Hate kuştinê kurê wêî ezîz.
Dayka pîr bihîst hawarya giran,
Xwest ku xeberde, lê zar negerya,
Xwest ku derkeve, here gundê xwe,
Lê qudum diha nemabû çoka.

Institut kurde de Paris

Ewê ber şikil çok da erdê,
Û bi kelo girî wa got ewê:
-Şîralîê min, şîrhelalê min,
Dayka teye pîr çok da tu anîî,
Bona azayê û bextewarîê...

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Li Nav Çîaê Kurdistanê

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

ÇÎAÊD KURDISTANÊ

Ew sekinîne mîna esheba,
Mil kutane hev wana qurnada,
Miqîm teyrok, bahoz û ba,
Bûne mêvanêd çîaêd kurda.

Ew şedê emir û cefa kurdane,
Ew şedê telebextê wane,
Sekinîne mîna kalêd zemana,
Şerada timê ew tevgel bûne.

Tu dibhêy nalîna wan çîya,
Kûr dikin axîn û nalîn jê tên,
Derdê wanara bûye qetran dinya,
Dewsa hêsra cew ji sîngê wan tên.

Qurnada civyaye derdê dilê wan,
Zûda vêketye kuçkê derdê wan,
Dilê wan da der agir û dûxan,
Hêlepîtka agir dighîje ezmana.

Wê agir girtye erd û ezman,
Tamarêd nifte cîda dikelin,
Xûna xwe dirêjin ewledê kurda,
Xwastina wane azayî, yan mirin.



Institut Kurde de Paris

Çîaêd kurda mînanî dayka,
Ew hemêz dikin zarêd wan kurda,
Kîjan bi egîtî bona azayê,
Hatine kuştin meydana şerda.

Û çend cara qurnê buhirîda,
Ew teyrê bazî ewledê kurda,
Hatine xweykirin derbê dijmina,
Hêwra xwe dîtine li wan çîada.

Hey bira bibhên dengê min,
Sidqê sax hûn ser rastyêne,
Wekî erz û ocaxa xwe xweykin,
Hemû bibin yek, hûn ji dêkêne.

We oxira welat, miletê xweda,
Dewa azayê we kirye kar,
Hûn ser rastyêne vê dewa xweda,
Hûnê bînin rayê dijminêd har.

Bira pirsê mine alava dila,
Bira bighîje, germke dilê we,
Tevî weme deqêd çetinda,
Rex weme ez, nava cêrgê we.

1963

Institut kurde de Paris

ÇÎAÊD ZAGROSÊ

Çîaêd Zagrosê mînanî dayîka,
Kurd hemêz kirne li ber singê xwe,
Gujmêd wan bilind, kubar sekinîne,
Ew bûne sondê egîtê lawêd xwe.

Çemê Feratê ava qudretî,
Dikşe fûrdide kember xeyatî,
Mîna şîrê şêr qem - qinyat dike,
Lawêd xwe egît, lewêd xweye tî.

Kurdistan bûke, bax, rez xemilî,
Kurdistan dêye, bi hub evîntî,
Erd û xwlya wê xubara dure,
Her lawek çawa teyr bilind difire.

Lê boy namûsê û boy xîretê,
Boy erd û xwelyê, boy eşîretê,
Hazire her kurd wek Rostemî Zal,
Sed bendîra dayne dew û qal.

Tim piştbavanê kêm taqatane,
Xêrxazara ew doste û bira,
Kedkirêd helal, zor û xebatçî,
Bal wana tune çevqulî acî.

Boy serbestya xwe, namûs, hurmetê,
Keç û xort temam ketine xîretê,
Dixwazin hînbin bi zimanê dê,
Ruhê xwe bidin boy welatê lê.



Institut Kurde de Paris

## HER QÎZEKE ME GULANE

Her qîzeke me çinareke,
Bi bejn û bala şîşmanî,
Navkêlk zirav taylanîne,
Horîê hikyatîne eynî.

Her qîzeke me guleke,
Suretê sor, gulin eynî,
Lêve nazik, kaxetîne,
Bedewya wanra ez benî.

Ez benîya wan dayîka,
Ku welidîn, ew qîz anîn,
Gulê, Sosin, Kulîlk, Çîçek,
Hezar navê wa lê danîn.



Institut kurde de Paris

## KİLAMA QİZA KURD

Bin vê teva geşda ez,
Xwezil bibûma kewekê,
Min bida başka bi lez
Bigeryama dinyalikê.

Bikira qîrîn û bistira,
Kilamêd edlayê,
Ba dengê min bela kira,
Her çar qulbê dinyaê.

Yan bibûma mixekî pirê,
Li ser rîya edlayê,
Boy temamya merivayê.

Yan bibûma pere kaxez,
"Edlayî" - ser min bihata nivîsar,
Yan bibûma dareke çinar ez,
Tim bidîta edlayî û bahar.

Institut kurde de Paris

ZIMANÊ DÊ

Tu, zimanê minî dê, wekla te şîrin dibêhêm,
Mîna dura zelalî tu, mîna xwelîya kardar,
Tu xiznekî, derxistî ji kûraya bin erdê,
Ser te xûsîya sibê, dişxulî mîna şemalê.

Tu ji kûraya qurna têî, diçî berb rojê bên,
Derbaz bûyî ji tarîyê, birqê û birûskê,
Bi şemala roja geş tu qal bûyî û hasil,
Te nav xweda xwey kirye merivayî, ruh û dil.

Kal - bavê min bi qurna - wan bi te xeber dida,
Rast û bestê meye rind - li nav şaxê çîada,
Tu bûyî tîr û nîze, tu bûyî sîliha destê me,
Te em xwey kirin ji dijmin, tu bûyî mertala me.

Şeherê Muxurzemînê û li Cizîra Bota,
Mem û Zîna dilevîn bi te zimanî xeberdan,
Merîfet û egîtî hebû li dilê wanda,
Merivayî, hurmet û hub bêqeyas weke bera.

Bi te zimanî stran şayîrê me kurda,
Li ser çermê nazik, lê bi herfê ereba,
Tunebû nivîsara me, lê zimanê meyî dê,
Mîna emir nemire, qurnada tê wekilandinê.



Institut kurde de Paris

Şayîrêd meye kurd aha ber çevê minin:
Melle Batî û Teyran, Ahmedê Xanîî mezin,
Tarîqnivîs Muqrîanî, Şerf-ed-dînî zane,
Pirsî alav, fikrê dur nemir li dinê mane.

Tu zimanê minî dê, pesnê te çawa bidim niha,
Mîna zincîra zêrîn dirêj bûyî bi qurna,
Te ji dilê me dûr xistîye tirs, saw û zelûlî,
Te mîna dê top kirîye miletê belabûyî.

Te daye jin-merê kurd emrê şa û xweşbextî,
Te xwey kirîye ruhê me ji xiravîyêd qewimî,
Tu ketî cenga şêr, şerê emir - mirinê,
Bûyî sûre û berge herwextî û timê.

Û roja îroyîn bin şemala teva geş,
Tev zimanê bira diwekilî tu xweş,
Kilamê bi te sêwirî derbaz dibin çîa, banîya,
Dikin xulexul, dikişin,zelalin, avê kanîya.

Tu şîrinî, zimanê dê, bi dil ez te hiz dikim,
Bi dil ez te hiz dikim û bi te şa dibim,
Dilê minda qîmetê te her tiştî bihatire,
Çawa ku bona dê ewled şîrintir tune.

Institut kurde de Paris

NEMA DÊ

Tarîbar bû hê... Stêrek temirî,
Ew jî steyrk bû li nav hezarî...
Baê berbangê hêdî kir xuşîn,
Hejand gul - gîha, baê dil birîn.

Steyrek temirî, steyra eskerkî,
Esker bû tenê, yan ewled boy dê ?
Cahil bû tûre, bex - miraz pêşîyê,
Guman bû boy dê, dinya ron boy wê.
Steyra wî temirî, xeîrî ji dinê.

Ew çiye ? keye wa dike nalîn ?
-Dibe kendalada ba dike zarîn ?
-Keye ardimîyê dixwazê hêdî ?
-Wê ji kîrişa dihedime xwelî.
-Na birîndarekî cahile dinale,
Xeleqa dijminda tenê maye,
Hevalêd wîye eskerêd ereb.
Binhêre, hê wê ew tenê xuyan,
Xubara pîyê wan dighîje ezman.
Çevê xwe digirt esker weşketî,
Nêzîke axrî, dil dide şedetî.
Çevê xwe vedike xema bîr dike.
Merîyê nenas serra sekinîne.

Institut kurde de Paris

Gelo kêne ev û çi merîne ?
Ku kumê eskerîyê serê wan nîne,
Teve kolosin, kolos rîşîne,
Kolosê serê wane kurdîne.
Çev lê diqulibin, maliq dimîne,
Helabelêda dîa xwe dibîne,
Nav dûxanêda dê dilezîne,
Serê wî ji erdê hiltîne,
Ber sêrî rûdnê wî hemêz dike dê,
Germ dike dêmê wî bi ramûsanê,
Û dibê: "Lawo, tu hê cahilî tûre,
Emir, xweşbextî hela pêşîa te".
Ew dibhê dengê kutana dilê dê,
Ku heybet lêdixe mîna sehetê.
Li ser enîya xwe ew dibîne,
Giranîya destê dêyî qerçûme,
Ya bi çevê hêsir û kela tijî
Li wî dinhêre. Esker kir gazî:
-Çiye dayê, tu çima digrî ?
Ez çi dibînim qayş û qirme,
Navkêl û pêsîr temam aşirme,
Çek - sîlih kirî tivinge destê te,
Ne mîna yê me kinc - rihalê te,
Eynî eskerî, eskerî egît,
Kêyî tu ? Nizam, dibînim ne dîya minî,
Lê borcdarim, ku tera bêjim - Dayê.

Institut kurde de Paris

Kêyî tu ? Ku ser mida hêsira dibarînî,
Ser mida, ku ez pêşya kurda rabûme,
Daykê kurdî, çiqase rema dilê te...

-Ez dême, raste ne ewledê minî,
Tu jî ewledî, mîna ewledê min,
Ez te dinhêrim, lawê xwe bîr tînim.
Duh basîsta boy kuştinê birin.
Belê,kurdim, tu jî erebî,
Tu birîndarî, xûn te miçiqî,
Merî temam yekin rûbarê dinê,
Hukmê qetlûya dikşînin cefê.

Serê esker hêdî berjêr bû
Û pirsêd wa ji dêv rêz bû:
-Ez zef najîm, tu mira bûyî dê,
Lê dîya min, hîvya mine li wê,
Berîya mindane nema min nivîsîye,
Çend xebera jî tu jêra binvîse,
Binvîse: "Xûşkê wekî kurê te,
Paşî şêr wefat bû singê çîa,
Li ser milê min dayîkê".

Berbanga sibê bû, steyrk temirî.
Vêsîya, unda bû nav steyrkada...
Ba bi melûlî hejand çirpî dar,
Wefat bû esker, stêrek hate xar.

Bi derdê giran, bi kelogirî,
Dê nameke xûn derxist berîyê wî,
Hilda wê daya çek - sîlihkirî,
Melûl sekinî û kûr fikirî:
-Belê, ezê binivîsim... hêdî xeberda,-
Ne tenê dîya te, boy temam dayika,
Yê law unda kirine û derdin dilda,
Temama silav kim, silava dayika.
Kê bin, kê nîbin, zimanê me yeke,
Dilê her dayka hevdu fem dike,
Herge erebbe, kurdbe, yanê tirk,
Dilê deyka yeke, bê şube, bê şik,
Yekin derd û keserê dayika,
Ku şerada,
Unda dikin ewleda.

Her wexta û dilê her dê,
Dişewite, digrî, dikale,
Wexta ku dibe hêlûna derda.

Binhêrin, wê dîsa steyrk temirî,
Idî nikarî îza wê bibînî,
Bi heybet dihejin çiq û dar,
Eskerek wefat bû, stêrek hate xar.

-Heta kengê emê wa ker bin,
Bêjin dayikêd dilkedere miqerim.

## HERGÊ ŞIKILKÊŞ BÛYAMA

Hergê min bikarbya bikşanda
Şiklê çîaêd Kurdistanê bilind û kaw,
Minê rengê sor bidaê...

Hergê hinka bigota: "Çima ?"
Minê bigota: "Çîaê me nav agirda bûne
Rengê wana hê neçûne..."

Hergê min bikarbya bikşanda,
Şiklê xwelya Kurdistana çerçirî,
Minê bidaê sorê girî...

Wekî hinka bigota: "Çima ?"
Minê bigota: "Sîngê wê qerez
Hatye avdanê pê xûna gevez..."

Hergê min bikarbya bikşanda
Şiklê avê çem û kanîê sar,
Minê rengê sor bidaê...

Heger hinka bigota: "Çima ?"
Minê cab bida xurt û babax:
"Serdilê mêrxasa wir bûne xwelî - ax".

Institut kurde de Paris

Wekî min bikarbya bikşanda,
Şiklê çûk , mezin , xûşk û dê,
Minê rengê sor bidaê...

Wekî hinka bigota: "Çima ?"
Minê bigota: "Minva tê xanê
Dilê wan dişxule bi agirê gumanê..."

Û wekî bigotana: "Çima her sor ?"
Minê wanra xeber bikrana dor:
"Ser vî çîaî, ser vî aranê
Agirê çûyî minva tê xanê..."

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Dilê Bengî

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

PÊŞTIRÎ MIN

Xwezil dilê te qeya bûya,
Tu kesî tu nedîtay,
Pêştirî min, pêştirî min.

Xwezil hêwra te çîa bûya,
Lingê benda wir neketa,
Pêştirî min, pêştirî min.

Tu êş - êşûk te nedîta,
Hewce nîbyaî tu hekîma,
Pêştirî min, pêştirî min.

Xwezil carekê te bigota,
Ku tu benda nahebînî,
Pêştirî min, pêştirî min.

Institut kurde de Paris

## TENÊ EW TU BÎ

Bibe tu xîza bera,
Nazdara min,
Şepe bigre kenera,
Ez bibim kefa nazik,
Ser pêla bêm nermik,
Sîngê te kevim,
Niqo bim, ax binicim
Kûr, kûr...
Bêguman mina bim.

Bibe tu dora bîê,
Emrê min,
Kezya daxe, rû fedîke,
Ez ceweke bêhidûr,
Bilîzim tevî wan gulya,
Ax, ez zanim
Emirda îdî nagîje min dor.
Danizil,
Danizil,
Serê kezya ramûsim.
Eger belgê te şil bûn,
Bizanibe ji hêsirê min bûn,
Ji şabûnê dil tije bû,
Hêsir barîn, bûn çem û çûn.

Institut kurde de Paris

Bibe tu şemsê nedîr,
Narîna min,
Bi pencê xwe ruh bide min,
Ez jî zîlek nav zîlada,
Ji nûra te qewat hildim,
Ax, ez zanim axirya kin,
Ezê hişk bim, biçilmisim,
Bê reng, bê deng wa unda bim,
Ne kedere,
Tenê, tenê ji nezera te bimirim.

Bibe tu şarûr, teyrka bedew,
Bilbila min,
Perwaz bike, erşa gavke,
Lê ez gulek, ji gulêd bişkivî,
Tek tu were, were bal min,
Hêlûna xwe sîngê minda dayne,
Ne minete,
Eger ez zû biçilmisim.

Institut kurde de Paris

Bibe çemekî gur,
Hizreta min,
Fûrde, jorda were xar,
Lê ez jêrê,
Bin pîê te,kevirê sar,
Ji zerpê te dilê minê pir şabe,
Hergê taraq bim jî,
Hergê bimahim jî,
Awqas, Awqas, ku bihêlim avêda
Ne minete,
Bira tenê her ew tu bî.

Institut kurde de Paris

x

x x

Hizkirya minî bi hezar dilî,
Ez te hiz dikim, nazikî horî,
Bisk û kezîê te baqê gulane,
Ez hisreta te, lê ji min dûrî.

Bisk û kezîê te baqê gulane,
Xeber şerbetin ser lêvê te,
Xewna dibînim bibûya rastî,
Hişyar bûma bidîta rex minî.

Boy te bûme bilbilê sewdalî,
Boy ditîna bejn û bala têlî,
Gula nazike, gulî, huba min,
Ji min dûr, boy min xewnî.

Ax, tenê carkê min bidîtaî,
Dilê zûzyaî tu hemêzkiraî,
Dinya ewravî min bibya saî,
Dilê min bihêwrya eşq-şaî.

Institut kurde de Paris

x

x x

Teweqe dikim naza min,
Bin çevara min nenhêr
Bijangê te, dêmê tera
Nûr û neder têne şêr.

Bin çevara min dinhêrî,
Bijangê te dibin tîr,
Dilê mida ew cî dibin,
Ber zergê teme hêsîr.

Bihingêve, min bide cefê,
Bira gunê te min neê,
Tek bizanbe, te hizdikim,
Qûlê huba teme zerîyê.

x

x x

Vê êvarê te ez helandim,
Te ez helandim dil kevir,
Çi bin çeva min dinhêrî,
Hiş û sewdê min te bir.



Institut kurde de Paris

x
x x

Divên cêr jî xeber dide,
Lê zimanê wî tune,
Wexta ku ber ba dibe,
Sewt ji cêr bîter dibe.

DINYA BIVE HINGIV, ŞERBET

Dinya bive hingiv, şerbet,
Niqitke av besê mine.

Dinya bive gul - gulîstan,
Gulek tenê besê mine.

Dinya bive birc û sera,
Koxkî biçûk besî mine.

Ji malê dinê û defînê,
Hizkirya min besî mine.

Bira herkes qurna bijî,
Rojek tenê besî mine.

Rokê tenê bijîm dinê,
Tev huba xwe, besî mine.

Institut kurde de Paris

## ÇÎAÊ SÎPANÊ BILINDE

Bilinde çîaê Sîpanê,
Bindarûka qîz - bûka
Timê baê hênik lê tê,
Û xulîna cew kanîya.

Pêşîêd me li Sîpanê,
Hêwîr danîn û lê man,
Ew xilaz bûn qehr û zulmê,
Wa derbaz bûn sal zeman.

Hezar Sîabend bi navekî,
Bûn nêçîrvan Sîpanê,
Bi dil stran hub, evîntyê,
Û çûn ji rû dinyaê.

Hezar Xecê - Zerîn hatin,
Û av hildan ji kanîya,
Ji dest edet hinav petin,
Wan xazalêd serê çîa.

Institut Kurde de Paris

Bilinde serê Sîpanê,
Tim baê hênik lê tê,
Qey dibêjî gul û sosin,
Distirên miqamê hubê.

Xulîna cew û kanîya,
Ku ji Sîpanê tê xarê,
Qey dibêjî nêçîrvane,
Dilezîne berbi yarê.

Bi hezara teyr-teyrede,
Çiveçiv eşq distirên,
Ew distirên li her wexta,
Nalîna Sîabend nabihên.

Dengê bê, çivîka û xulînê,
Tim tê ji çîaê Sîpanê,
Ku dengê Xeca dilbirîn,
Zarîn, nalînya wê kes nebihê.

Institut kurde de Paris

## XEBERDAN

İro bengzê te çima xweş nabe,
Gula dêmê te usa çilmisîye ?
Çevê teye reş, nedîra roê,
Çima bûne qûlê melûlîê.

Çi te qewimîye, çima nakenî,
Serberjêr sekinîî û min nanhêrî,
Bêje, xeberde qîzê, ez benî,
Çima tu usa bi dil melûlî ?

Hizkirî zivirî wa got wî xortî:
-Çima tu îro wa min dinhêrî ?
Bengzê min melûl, çevê min rîa te,
Dilê min bi xûn, tu bi dilê xwe...

Institut kurde de Paris

XEMA NEKE

Ser paîz bû, sibe bû zû,
Xêlîya tarîê berev dibû,
Avya sibê li ser gula,
Dibiriqî mîna dura.

Ro ku derket, nûr geşkir,
Emr û tebyet hişyar kir,
Baê nermik hejandin gul,
Gula barand hêsirêd dur.

Ku bû nîvro, tevê qijiland,
Ba jî zîz bû û gur lûrand,
Ji gulê mawer belq anîn xar,
Gul bûn çirpî, man bêstar.
Delala min, xema neke,
Zanî emr jî bahareke,
Yazix neê tu wan gula,
Gela baharê wê bên hela.

Institut kurde de Paris

XEWN

Rûniştibûm ez,
Ber baxê sêva,
Û belgekî şîn,
Girtibû lêva.

Duşurmîş dibûm
Û min nişkêva
Dor xwe nihêrî,
Tu ditî wira.

Tu sekinî bûyî,
Te min dinhêrî,
Lê min nizanbû
Çi difikirî.

Nêzîkî te bûm,
Min go: -Were vir,
Tu cî nehejyaî,
Min go: "Dilkevir".

Te xeber neda,
Min jî xwe şerm kir,
Xewê hişyar bûm,
Çevê xwe vekir,
Xwezla xwe anî
Bona xewna dî,
Gelo dibe,tu
Ji min xeyîdî ?

Institut kurde de Paris

## NAZIKÊ

Lê nazikê, nazdarê,
Sîng meydanê, bejn ziravê,
Gerdan gazê, kubarê,
Çevêd agir karbarê.

Lê nazikê, nazdarê,
Qalçîçeka baharê,
Niqitkê xunavê serê,
Têr nabim ji dîndarê.

Lê nazikê, nazdarê,
Sewta bilbila serê,
Huba gula li serê,
Guh bide vê xeberê.

Lê nazikê, nazdarê,
Min bike qaşa kimberê,
Bide min tu ramûsanê,
Bira sebra min te derê.

Institut kurde de Paris

MIN TU DITÎ

Min tu ditî li ser kanîê,
Te zêr dabûn ber enîê,
Dest teda bû cêrê avê

Dûrva dîtî, ber bi te hatim,
Ji şabûna erdê ketim,
Tu kenîayî, te hîlatim.

Min ku çok da ber kanîê,
Te da dest min cêrê avê,
Ji cêr huba te min vexwar.

Min ku vexwar ew ava sar,
Çevê te bûn cot tîremer,
Min hingavtin dil û ceger.

Ew zef cefe didine min,
Bedewê,tu ruh û emrê min,
Ramûsanekê tu bide min.

Ew lêvê nazike şekirê nebat,
Wê li min bibin avilheyat,
Û ewê bibin du sêvê xelat.

Institut kurde de Paris

## KARXEZALÊ

Karxezalê tu ji min netirse,
Hêvilmîş nebe, ji cî banz nede,
Qûlê hubême, bise bêm cem te,
Ez têr bivînim çev û birûê te.

Ji min netirse, nêçîrvan nînim,
Lê şev û ro çîa digerim,
Ez hisretim, dixwazim te bivînim,
Hisreta dilê xwe ji te hilînim.

Çima nêçîrvan te didin cefê ?
Dilê wanda tune misqala xofê,
Qe hizkirîê wan tune rû dinê ?
Ku pey we digerin û dikin qetlê.

Bisekine Xezal, bûme mecrûm ez,
Dilê minda xûn bûye kêlê gevez,
Çîa û banî xemilîne şînayê etlez,
Bise, meşaqim, têr te bivînim ez.

Institut kurde de Paris

## TUNCIKZER

Porî-zer, tûncike - zer,
Lêve narîn,simêl - ser,
Çeve tasin, gilover,
Birû pilte, ewrin ser,
Li piştêye zêr kember,
Meydana enya kever,
Wa dibêjim ez yek ser,
Ew guleke xunav ser,
Xortî çêye hub li ser.

Institut kurde de Paris

SIFET

Pêşberî min qîzek rûnişt,
Pir bedew bû, teyrka buhuşt,
Çeve reş bûn, birûye kêr,
Dran sedef, por - rengî zêr,
Bejne bilind, navkêl zirav,
Dilê minda vêxist alav,
Sûret sor bû agirê teref,
Serxweş kirim ez bê şerav.

Institut kurde de Paris

DELAL

Delal, huba min bû kanî,
Pê hat avdan çîa û banî,
Li sîngê çîa te seyran kir,
Gula mawar rewaî te kir.

Te ku destê xwe avît gula,
Xubar ser bû mîna hêsra,
Ne baran bû, ne şilî bû,
Ew xubara jî xubara min bû.

Ax, wexta te gul bîn dikir,
Xubarê davît ser kevir,
Mîna zirî kevir qul kir,
Min bihîst nalîna kevir.

Institut kurde de Paris

## SER KANIÊ

Tarîbara êvarê bû,
Min lezand ber bi kanîê,
Min dî koma qîz-bûka,
Vegeryan ber bi malê,
Delala min nav wanda,
Cêrê avê ser mila.
Hêdî berbi wê çûm,
Ez ku dîtim sekinî.
Min go: - Qîza delal,
Ramûsanekê tu nadî ?
Hevalê te dûrin,
Kes me nabîne îdî,
Go: - Biceme, unda be,
Ramûsana par da te,
Temam gund pê dizane.

Institut kurde de Paris

DELALÎÊ

Delalîê,tu diçî avê, masa pêke,
Dîlberê, texmîn here, zîanê meke,
Nazikê gul - sosindorberê rê
Tekmîl here, pêpes meke.

Delalîê, bahar heye zeyneteke,
Dîlberê, cahiltî jî emreke,
Ezîzê gul û sosinê vê baharê,
Tekmîl here, pêpes meke.

Delalîê, tu vedigerî, xwe bîr meke
Dîlberê, gul-sosina pêpes neke,
Hergê huba min heye dilê teda,
Bedewê, avde gulê ber zinêrda.

Institut kurde de Paris

KILAMÊ BENGYA

Xort:

Bahare hêşîn vebûye,
Dorber eşq û şayî,
Binhêr delal ez li virim,
Çima li min nanhêrî ?

Qîz:

Ev bahara bi şayî hat,
Xortê delalî ezîz,
Ez guleke baharême,
Min biçirpîn, bistrê zîz.

Xort:

Sîng-berê te qîza delal,
Berfa spî, yekşevî,
Te dilê min vejandye,
Kirye hêlûna bêxweyî.

Qîz:

Gulê nazik wê vebûne,
Strî dorê bûne çît,
Çevê xirav nehingêvin,
Delalê minî egît.

Institut Kurde de Paris

Xort:

Çîaêd bilind, avêd zelal,
Hey ezmanê pir hêşîn,
Mira bêjin çima bextêm
Bûye teyra perweşîn.

Qîz:

Ber derê me kanîk heye,
Miçiqîye vê baharê,
Delalyê min kesirî bê,
Huba min kanya kewserê.

Xort:

Tarîyê erd hilçinîye,
Nûre ronaya çira,
Rê agire fesal were,
Karka mine xezala.

Qîz:

Baê çîyê dilîlîne,
Dilê min melûl diente
Ber steyra rûniştîme,
Dua dikim bona te.

Institut kurde de Paris

Xort:

Çîaê me çîane bilindin,
Obe û zome lê pirin,
Tu kara mine xezala,
Nêçîrvanim te digerim.

Qîz:

Sîngê çîa kon û çadir,
Bêhesav ketine rêzê,
Delalê min mêvan bûya,
Ez biketama hemêzê.

Xort:

Çûme çîê min nihêrî,
Kişyan qelfê qîz-bûka,
Delala min dibiriqî,
Mîna qaşa gustîlka.

Qîz:

Delalê min şivane,
Qemerî simêl reşe,
Delalê dilê mine,
Nazikî pir keleşe.

Institut kurde de Paris

Xort:

Ji xwedê hîvekarim,
Cêrê destê te bişkê,
Ez, tu li rex hev rûnên,
Hîvya tebe malda dê.

Qîz:

Wexta hîva zer derket,
Sî li besta zêde bûn,
Mîna sîkê, delalê min,
Bi ruh em cem hev bûn.

Xort:

Stêra nîvê şevê derket,
Ba seqirî tûmada,
Xwezî îşev delala min,
Min ramûsan te hilda.

Qîz:

Ez çi bikim dorberê min,
Çevê xirav pir hene,
Kûra hubêda dişewitim,
Nizanim çi bikim mene.

Institut kurde de Paris

Xort:

Delala xwera min got:
Delal, te soz dabû min,
Te sond xwar şexs, zîareta,
Ku bivî qismeta min.

Qîz:

Ji sozê xwe poşman nînim,
Tuî stêra emrê min,
Bavê min bide mêr,
Ezê tera birevim.

Xort:

Tu delala dilê min,
Zînkirîye hespê min,
Ku miraza şabin,
Were te birevînim.

....................

Şevetarî, ker û hêsa,
Sîyarekî daye ser rê,
Muhbet û huba wî,
Ber sînge, gula sebrê.

Institut kurde de Paris

## ŞAİR Û HIZKIRYA Wİ

Rokê şaîrê dilalav,
Rastî hizkirya xwe hat,
Wî bi dil da wê silav,
Vekir dilê xwe qat bi qat.

Hizkirya wî medekirî,
Lê nihêrî û wa got:
-Te bi pirsê liqat kirî,
Bal min hişê xwe firot.

Gul û sosin û huba min,
Niha karê nadin te,
Bistrê niha bilbilê min
Ulm, zanebûn, maşîne.

-Kewa gozel,ez şaîrim,
Perda zimanê min tune,
Li ku tebyet û hub tune,
Wir çi ulm û maşîne.

Institut kurde de Paris

x x x

Ax, ber hesuya konê me reş,
Min dilkovan girt ew dest,
Min ji keça xweye çevreş,
Ramûsanek her jê xwast.

Min go: "Ew çev cot kanîne,
Tu bûyî hêwa baharê,
Kê ew bona min anîne ?
Lê şîrinê, lê canê.

Îznê bide ez ramûsim,
Sûretê te mîna gul,
Ez te bengî, te hewasim,
Te hiz dike, ax, ev dil.

Serî xar kir, dêm min guhast,
Bi dengê xweş hêdî got:
"Zanim, te ji min ramûsan xwest,
Dilê te jî ev dil sot".

Min ramûsa gerdena zer
Bi dilê gur, evînî,
Ramûsan bû agir, keder,
Li nav dilê min danî...

Institut kurde de Paris

KANİ

Li min pire niha hizret,
Kanîk xwera kirye zîaret,
Timê diçim ber wê kanîê.
Bûye zîaret ew kanî,
Kulme avê vedixum jê,
Ya ku te ji wê av danî.

Institut kurde de Paris

# Li Ser Sîngê Elegezê

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

ELEGEZA MİNRA

Tu Elegeza mine şîrin, şîrin,
Tu mîna teva heta - hetayê,
Ser sîngê xwey geş xwey dikî delal
Hezar û hezar kanîê sar, zelal.

Ez va dinhêrim bejn û bala te,
Li heçêd te dur û berfa spî,
Tu li bin ezmîn, ji ezmîn bilind,
Sekinîî ser pîya awa bi qurna.

Carna xwe dikî alav, zêr-zer,
Carna ewrê reş li xwe dipêçî,
Carna rehetî, carna bi bager,
Şûrê birûskê hiltînî ser xwe.

Lê hertim çawa dîya rehm dimînî,
Dimînî nazik, nazik dilovan,
Timê bi rûken, timê bi saî,
Tarîê ronayê, tu sebir dikî.

Qîz û bûkê kurda aza û dilşa,
Ku têne pêşêd teye xemilî,
Tu divê dibin rewşa xemla te,
Dibine kulîlk nav kulîlkê te.

Institut kurde de Paris

Nav bera kulîlka ba nerm dilîze,
Hub, hizkirinê dibêjin hevra,
Şivanê cahil bi dil distirê,
Niqoî bera kulîlkê te dibe.

Tu Elegeza mine gul û geş,
Ronaya geşî, ezmên hatî,
Te hesab dikin, çawa hub,miraz,
Ermenî û kurd û adirbêcan.

Qîz, bûkê kurd, nisleta teze,
Ew nînin îdî, çi ku berê bûn,
Ser pişta hespa koçer û sêfîl,
Ji warekî diçûn warekî din.

Na, ewana mîna berê nînin,
Çîaê minî ezîz, çîaê minî dê,
Nav kulîlkêd teye bi hezar rengî,
Emrê xweşbextîê ew derbaz dikin.

Bira timê geş be ew bextê daî,
Mîna te qewîn, mîna te zelal,
Mîna te bilind heta-hetayê,
Elegeza mine şîrin û delal.

Sala 1948
Çîaê Elegezê

Institut kurde de Paris

## LI SER SÎNGÊ ELEGEZÊ

Erdê wergirt xêlya tarîê,
Tê kalîna berx û mîa,
Li ser tûmê gul, hewşanê,
Bilbil huba xwe distira.

Sîngê çîaê Elegezê,
Mîna kelik û gemîya,
Kon û çadir ketne rêzê,
Li wê bera gulada.

Hîv jî awa, ji nav ewra
Derket mîna kar-xezala,
Ezman ber wê mêrg û zevî,
Nav stêrara ew direvî.

Kona wêda sîngê çîê,
Li ber heçê miqîm sî ser,
Berra dikşe cew ji kanîê,
Ew av dide mêrga mexmer.

Institut Kurde de Paris

Sîya heçe bûye star,
Boy zozana, çeve xumar
Boy Eslanê şev-ro çolê
Bi evîntî hatine yolê.

Hinkî wêda mexelê pêz,
Ew guhdarê kilama kanîê,
Steyr ezmana wê bûne rêz,
Nûr dibare ji dêmê hîvê.
Lê wê şevê hub û muhbet,
Bûne kanî û dikşin,
Wan bîr kirye erf û edet,
Dilêd alav hev radmûsin.

Li ber sîê heçê amin,
Du dilê tî avê vedixun,
Ji baê nerm gul dihejin,
Gul xazilê li wan tînin.

Institut kurde de Paris

## DİSA LI ZOZANA

Çend sal şûnda berfê hêdî,
Ax, xwe avîte serê min,
Û ez rabûm, min go, gidî,
Ez diçime çîaê xwe.

Selam da min mîna hercar,
Çîaê minî kevnî serqot,
Ava wîye sar û kubar,
Bi dengê xweş kilam digot.

Mîna hevala te bûme mêvan,
Dor te tijî obe, zome bûn,
Kete guhê min dengê kar, berxan,
Qîz-bûkê kesk-sor dihatin, diçûn.

Ez te hiz dikim, wey zozana xweş,
Hatime bal te, bîra te kirye,
Kulîlkê teye xalîçe û nexş,
Min zarotîyêda gelek hizkirye.

Gele-gele qîz-xortê te,
Van zozana bengî bûne,
Û gihîştne mirazê xwe,
Û li vê dinê hatine, çûne.



Institut kurde de Paris

Tu her xweş be heta hetê,
Û her bahar vebe bi ken,
Çimk li ser te gelek kilam,
Vir strana gavan, şivan...

Û her hebe, hebe zozan,
Mîna ruhê efatê zor,
Û vê qurnê, li van dewiran,
Çîaê mine kulîlkê sor.

Institut kurde de Paris

## XEZALÊ ÇÎA

Roê şewqa xwe avît ser dinê,
Gula çevê xwe vekir ji xewê,
Pez û dewar ji gund derketin,
Teyr û teyrede rabûn ji xewê.

Komê zerya meşyane avê,
Xemil biriqîn li wan sîndanê,
Bi ken,laqirdî, stran, xeberdan,
Nûr dibarî ji dêm û lêvê wan.

Navkêlkêd zirav, cêre ser mila,
Bendêd fire hêwra xemlê me,
Qîzê vê dewrê, zerîyê me kurda,
Eynî xezalin, xezalê çîa.

Institut kurde de Paris

## XEW LI ÇEVA HERİMANDYE

Ez distirêm şev û roê seva te,
Birû, bijang min kildane seva te,
Xortê nazik, xortê tûre, zû were,
Min pez dotye, şîr kelandye seva te,
To û nivîşk min hildaye seva te,
Du şeve min xew li çeva herimandye,
Xortê nazik, xortê tûre seva te.

## EZ TEVA GEŞ HIZ DIKIM

Ez teva geş hiz dikim, teva bi nûr û alav,
Tim sibê zû ew dertê, bi şewq, şemal û gulav,
Sîlihbûî tîr, penca, sawê dike ser tarîê,
Dinya hêsa xewêda, hişyar dibe ronayê.

Ez teva geş hizdikim, ewe melhema gula,
Nûrê dide ser dinê, emir dide ew zîla,
Hebê genim ji xalîyê pencê roê tînin der,
Misk û mawer difirin, gul û sosin û sûsenber.

Ber cawêda sipindar bilind dibin hindavda,
Ber bi ezmana radibin, huba roêne dilda,
Gelî, geboz û çîa hezar terzî dixemilin,
Mînanî qîzêd kubar, naz roêra dikenin.

Institut kurde de Paris

Teva zerîn hiz dikim, kanîa hubê bedewîê,
Çiqa dila germ dikin, şewq, şemal û nûra wê,
Delalya min ber tevê, ku biskê xwe badide,
Qey dibê nûra roê tevî kezîya dihûne.

Perçe kevirê lal û dur, nûra roê ku dide ser,
Hezar awaz reng hiltîne, keskesor jê dide der,
Ez teva germ hiz dikim, ew muhbeta dilane,
Ez teva geş hiz dikim, ew gumana bendane.

Ez teva nûr hiz dikim, eşqê dide teyreda,
Li erşa perwaz dikin, bi per, bask û qanata,
Tenê bûm û kundê kor dikevine xepengê,
Heta ro diçe ava, paşê dertên seyrengê.

Ez teva nûr hiz dikim, dertê mîna zerîkê,
Û kezîyê xwe ew delal, dike tîrinca kulekê,
Û daykêd kewanî, derê malê vedikin,
Pez û dewar ji mal berdidin, verê dikin.

Boy wê hiz dikim tevê, ku diçe ava êvara,
Û siba zû ew dertê, tarîê davê kewara,
Bi pencêd zere nîze, bi ken erşa dilîze,
Ez wê tevê hiz dikim, dilê mida ezîze.

Institut kurde de Paris

## KULAVREŞO

Kulavreşê min, delalê dilê min,
Tu va kerîê pêz dikşînî berbi çîê,
Ax,xwezil îro min jî bizanbûya,
Tê ku bihêwirî bi xwe vê şevê.
Li ber wan kanîya, ku ez jî zanim,
Yan ber wê gola Elegeza me,
Kîderê ku ba dike şinge-şing,
Ava zelal nerm ser hevra diçe.
Delalê dilê min, gazî pêz dikî,
Dengê te zîze mîna dengê şêra.
Ax,xwezil îro min jî bizanbûya,
Tuê li kêderê bî, kulavreşê min.
Kulavreşê min, xwezil vê şevê,
Baran û teyrok bibarya ji ezmên,
Bi bilûra xwe te pez bikşanda,
Bona sitarê bihataî oba me,
Û ez biketama bin kulavê te,
Bikşanda bîna teye xweş-delal
Enya min tera bibûya meydan,
Bi ramûsana lê bikra seyran,
Kulavreşê min, delalê dilê min.

Institut kurde de Paris

PÊYZAJ

Piltêd ewrêd spî,
Li erşa, erşê hêşîn,
Mînanî kultêd pembu,
Hatin li hevdu civîn.

Refê çivîka û teyra,
Firxweş difirin hewa,
Bi eşq dilîzin zarok,
Kilama min wan rewa.

Esre, berî êvarê,
Digerim li Yêrêvanê,
Mîna maşoqa diçim,
Digerim temamya bajêr.

Çîa roê ku xemiland,
Û terîê erd hilçinî,
Ji steyrê erşa zeftir,
Ji şemdana nûr barî.

Institut kurde de Paris

ÇI NAVİ DAYNIM

Hey gulanê tu xweş hatî,
Te gul, çîçek xwera anî,
Çîa û banî tev xemilîn,
Dilkê xorta qîza danî.

Zozan geşe, temam kanî,
So û pêjek rex çevkanî,
Zozan xweşe, her der gelî,
Hey gulanê zozan anî.

Gundî temam ji gund hejyan,
Pez û dewar ber bi çîê kişyan,
Kawa min jî rex dê ketî
Ber bi konê me xwezil hatî.

Kanîya jorê tê, belekîye,
Dixulxule, deng şîrine,
Ez û kawê hev bengîne,
Rex te, kanîê, sekinîne.

-Kanîê, ava te miraze,
Kawa mine dil mereze,
Ku bengîme çi telaşe ?
Mi divîne, ça dimeşe ?

Kanîê, kanya mirazê me,
Bijangê wê mîna rime,
Ku dinhêre, dihelim ez,
Dixwezim bêm bi rev û bez.

Institut kurde de Paris

Kanîê, ava te zelale,
Kawê mîna karxezale,
Dixwezim pêra bigîjim,
Ew direve, ax, ez dînim.

Kanîê, binhêri, suretsore,
Suret sore ramûsanê,
Kanîê, binhêr, cî jî more,
Gelo, kîye xortê hanê.

Kanîê, binhêr, çevereşin,
Çevereşin ji kildanê,
Kanîê, binhêr, tev sedefin,
Dev, diranê wê xezalê.

Wê min rokê bi ken şake,
Rojtira dinê birîndarke,
Wê min rokê bextewarke,
Rojtira din dîn û harke.

-Xortê delal, çi dibêjî,
Ne bengîme tera ez jî,
Xewna şeva ka tê çeva,
Sebebê me xêrnexwazin.

Sala par bû, ji vê kanîê,
Min av dibir cêrê hanê,
Qîz û bûka hikyat digot,
Min jî tera kilam digot.

Institut kurde de Paris

Ew kilama reş û heşbe,
Dîa te bira gura harbe,
Çi xeberê netê bêjî,
Gundda gotye ber qîz-bûka.

Ew xeberê dîa te gotye,
Dil-hinavê min tev sotye,
Rengê xwe ku min avîtye,
Ji nifirê dîa te bûye.

Tu tîtalê minî ezîz,
Bejn bilindî mîna Masîs,
Sipingdarî - tu rex kanîê,
Sekinîme ez li ber sîê.
Çevkanîî, ez - ava te,
Qalçîçekî, ez - bîna te,
Tu ezmanî, ez - steyrka te,
Teva zerî, ez - şewqa te,
Tu gustîlî, ez - qaşa te,
Tu kevanî, ez - tîra te,
Tu baharî, ez - gula te,
Tu tembûrî, ez - sîma te.

Xwezil îsal xerîb byama,
Cara ewlin te nas byama,
Xwezila şerma dinê nîbya,
Ku em herdu hev têrbyana.

Sala 1953

Elegez

Institut kurde de Paris

x x x

De xatirê we, gulê delal,
Gul û gîha, belg û bax,
De xatrê we, ez wa diçim,
Ez, bahara we dilsax.

Pey minra va xûşka delal,
Havîna kawe porzerîn,
Wê bê li we gulêd nazik,
Têke pîrêd dilbirîn.

Havîn ku hat dinê nihêrî,
Her tişt keske û hêşîn,
Rengê gul û sosina guhart,
Daê rengê xweyî zêrîn.

De xatirê we, gulêd delal,
Ez va diçim paîz tê,
Paîz hêrse, wê we bikute,
Bi baran û zîpikê.

Lê bizanbin gulêd nazik,
Pey paîzêye - zivistan,
Wê ser qirş û qalêd weda,
Bibarîne berfa giran.

Gulê delal kenyan, gotin:
-Bahare her dosta me,
Saleke dinê emê dîsa bên,
Bi hizreta huba xwe.

Institut kurde de Paris

MEHÊ BAHARÊ

Mehê baharê, ax çiqas xweşin,
Ax, çiqas xweşin ev rojê hana,
Çaxê teva zer bi pencê xweva,
Pey sur û sermê ruh dide dara.

Mehê baharê, ax, çiqas xweşin,
Çaxê dihelin berfê arana,
Çaxê cew - kanî dikin xuluxul,
Jorda dibezin, rê nadin hevdu.

Çaxê teva geş pence vedide,
Li serê çîaê Elegeza me,
Û hezar rengî gulan vedibe,
Bona cimeta meye bextewar.

Mehê baharê, ax, çiqas xweşin,
Çaxê xortanîê tînim bîra xwe,
Ne axir ez jî mehê baharê,
Geryame xwera van deşt û gelya.

Mehê baharê, ax, çiqas xweşin,
Ax, çiqas xweşin ev rojê hana,
Çaxê teva zer bi pencê xweva,
Pey sur û sermê ruh dide dara.

Institut kurde de Paris

HUBA ŞIVAN

Şivanê cahil, ruhê te nazik,
Ruhê te nazik, wek zarok bêşik,
Ruhê te heval boy cew, kanîyane,
Ruhê te xûsîa kulîlk, karzîyane.

Şivanê cahil, zanim, ruhê te,
Zimanê emir, tebîyetê zane,
Lê wexta ezim, ezim li rex te,
Dibêî kilîtim ez boy zarê te.

Û tu bend dibî, ziman lalome,
Belê, fem dikim ez ji ruhê te,
Belê, kêm dibhêm xeberê te dur,
Xizna fikra te bera bê buhur.

Zanim bilûre, bilûre zarê te,
Ser wê dilîzin tilî, pêçîê te,
Sewt û miqam lê dibine kanî,
Huba te okyan, okyane eynî.

Lê wexta minra tu xeber didî,
Lêvê te nazik, naz diricifin,
Wexta bilûrê tu ku hildidî,
Hub, sewt û miqam çemkî dikişin.

Xunava li ser gul û sosina,
Bi evîntîya ew wanda dinice,
Kerê pez motac mîna evîna,
Çêrê bîr dike, dor te dicive.

Institut kurde de Paris

Tenê mirazek dilê mindane,
Xazî bibûma bilûra dest te,
Hub û evîntîya dilê tedane,
Min bixandana bi wan tilîê te.

Wî çaxê ezê nemir bimînim,
Bê minet bijîm mîna teyreda,
Ku ser lêvê te timê bilûrbim,
Û bibim kanîa sewt û miqama.

ŞEV LI OBÊ

Kon û çadir sîngê çîa,
Çipixîne hev mîna kerîa,
Nav oba û zomada,
Dikşin cewêd belekîa.

Roja nûr wê diçe ava,
Berev dike gurzêd kezîa,
Diseqire her tişt eylê,
Hoka-hoka şivana tê.

Ezmanê şîn mîna eba,
Dixemile stêrê geş,
Çîa mînanî esheba,
Dihênijin bi xewa xweş.



Institut kurde de Paris

Hîva zerîn nahênije,
Şeda dilê dilketîya,
Şewqa nazik ew davêje,
Boy evîna li ser rîya.

Wexta çolê, devê zanga,
Xort û qîz ku hev radmûsin,
Hîv dikeve binê ewra,
Çevê xerîb wan nebînin.

Ramûsan û sewta wana,
Tevî pêlê cewa dibin,
Ad û qirar, sozê wana,
Pêl kilamin berjêr dibin.

Dor min kere, ez teneme,
Li tebîetê mêze dikim,
Boy kilamê kezîyê hîva,
Ez vedihûnim, tertîb dikim.

Institut Kurde de Paris

## SER TEPÊ GUJME

Duh sekinîbûm ser tepê gujme,
Ji nihêrandinê têr nedibûm ji te,
Tu rûniştibûyî ber kuçkê êgir,
Te hêdî-hêdî alav gur dikir,
Li ber dêmê te dibû telale,
Agir radmûsa dêm û bryê te.
Şemsê nûranî li hêlana bû,
Bi nûra şemal ew te şa dibû,
Û baê hênik ji ernûsya xwe,
Ser namila te ketibû nav gulya.

Lê îro dîsa ji tepê gujme,
Ez wir dinhêrim dewsa konê we,
Li ber çevê min dibe meleme,
Ne tuyî, ne kuçik, ne jî konê we.
Ez berjêr dibim bême wergê we,
Bêm û rûnim rex dewsa kuçikê we,
Dibe ku tiştek te unda kirbe,
Bizvirî bêî, ez virim, hîvya te,
Dibe ku bext jî mera bikene,
Tevayî bibînin çik undakirye.

Institut kurde de Paris

# Şêrê Kal

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## GUNDİ Û ÇIVİK

Go, carekî yekî gundî,
Nava mêrgê çivîkek dî,
Û cî rabû ew kereker,
Herdu destê xwe danî ser.
Wir çivîkê kir hîvehîv,
Û ji tirsa kir çîveçîv.
Gundîyê eşqlû ew berneda,
Çivîk zar hat û xeberda:
-Ez guneme, gundî, gidî,
Min çi kirye, min bernadî ?
Qe nakşîne deqe, gavê,
Axirya dinê wê ese bê.
Gundî tirsya û lerizî,
Mîna kalekî hizhizî,
Cîda rûnişt qudûmbirî,
Çivîka te ji dêst firî.
Serê darê kir çîveçîv,
Eşq û kubar mîna bilbil...
Lê li gundî dil dikuta,
Rengê wîya bibû kitan.
Û feqîrî deqe - deqe,
Ew bû îdî ku biteqe...
Go: "Çivîka mal bi wêran,
Ez hêsîrî bûme dêran.

Institut kurde de Paris

Te go: "Axra dinê wê bê,
Qe nakşîne deqe, gavê..."
Wir çivîkê awa da cab:
-Vî gilîyê min hilde hesav:
Destê teye reşe qetil
Min dibirand emrê edil,
Min hatibû axrya dinê,
Sekinîbûm ber mirinê.
Vir tuneye tiştê derew,
Gilîyê rastî hema jî ew...

## SULÊMAN PÊXEMBER Û BALÇÊMK

Sulêmanî pêxember,
Ķire fermen û sefer,
Hukum kir ser teyreda,
Li ser bera erş-erda
Ku teyr temam top bin bên,
Û qesrekê bikin şên.
Ji per beskê wane xas,
Koçik-sera bibe saz,
Bona jina Sulêman,
Têda bive teva can.

Institut kurde de Paris

Û cab firî çar alî,
Teyr berev bûn wek xalî,
Danîn sobeta giran,
Hinek hêrs ketin, giryan,
Wekî ewe bê besk-per,
Wê bibine xwelî ser.
Ewê çawa bifirin ?
Bijîn û bidebirin,
Teyaxkin ber sur-sermê,
Li azana ber germê,
Bimînin bê bask û per,
Ay ecêva pirkeder.
Wir xeberdan kund û bez,
Bi hêrsehêrs, lezelez,
Lê balçêmka mixenet,
Rabû civatê derket,
Lêda çû cem pêxember,
Pante lêda wê li ber.
Ewê gava xanim dî,
Kir geveztî, fesadî:
-Teyrede tev - çûk-mezin,
Bona we bûne dijmin.
Eze tenê xîretkêş,
Perê min were pêşkêş.

Institut kurde de Paris

Go, -Xanima gerdergaz,
Hilde perêd mine xas,
Û wir jina pêxember,
Hezar tem xarin da ber,
Û ew balçêmka durû,
Têr xar, derket, lêda çû.
Derbaz nebû hê muxdar,
Xanim çû ax-berê sar...
Û Sulêmanê heznî,
Ferman paşda hilanî.
Gihîşt teyreda mizgîn,
Û wan bîrkir derd û şîn.
Rojê şabûn û firîn,
Heta çevê wan birî.
Lê balçêmka geveze,
Ji teyreda ditirse,
Û ew mînanî berê,
Roj dernakeve gerê.

Kê durûye, geveze,
Halê wan heye, ese...

Institut kurde de Paris

## DEVE Û BERF

Deveke wara mayî,
Koç - karvana qetyayî,
Diçêrya li arana,
Nava gul û rihana.
Emrê tenê dil wê sot,
Devê aha xwera got:
-Tenêbûn netutişte,
Hizkî cîê te buhuştbe.
Deve kete çil û çîa,
Xwera hevala gerya,
Ew deva bê ocax-mal,
Kes jêra nebû heval.
Serê çîê devê berf dît,
Û kubar gav wir avît.
Û kutasî, xulese,
Ew bûn hevalê ese.
Devê berfê kir hîvî:
Hevaltî nebe nîvî,
Herçê gava ku berf tê,
Gerekê cavê bidê,
Deve sermê qutnebe,
Lingê wê têda gut nebe,
Û ew xwe lê sepeke,
Çarekê xwera bike,
Ku bivîne kar, tevdîr
Zivistana kîrebîr.



Institut kurde de Paris

Berf hilkişya ezmana,
Deve jî çû arana.
Qure, qutan serfinyaz,
Xwera kêf kir, kir derbaz.
Û devenga çîl-qerqaş,
Nekir minet û telaş,
Ewê bez girt qatqatî,
Û bîrê çû hevaltî...
Berfê kir kar û tivdîr,
Hevala xwe nekir bîr.
"Ezê daynim serê çîa,
Û binixêm li her cîa,
Paşê daynim zozana,
Paşê herime arana.
Deve jî ho kor nîne,
Ewê xwe min bivîne".
Berfê danî ser çîa,
Paşê beroj û banîa,
Paşê hate zozana,
Paşê kete arana.
Lê ew deva kok û hît,
Berfa serê çîa nedît,
Nedît berfa zozana,
Paşê berf dît arana.



Institut kurde de Paris

Deve hêrs ket, da tira,
Hate berfê nifira:
"Lê-lê, berfa bêîtbar,
Ev bû li te soz qirar ?
Nişkêva lêdayî hatî,
Neda min elametî,
Kanê, ku ma hevaltî ?"
Berfê go: "Deva qure,
Qurebûnê nefire.
Tu qureyî û qutan,
Qe nanhêrî li ezman ?
Min hat danî serê çîa,
Paşê beroj, bilind cîa,
Paşê hatim zozana,
Paşê hatime arana.
Ê mîna te qure, têr,
Hevaltîêra naên kêr..."
Hindik nînin merivê ha,
Hevaltya wan kul û ta,
Hevaltya wana jere,
Merivê am - tam digere.

Institut kurde de Paris

## KÛSÎ Û XEZAL

Kûsîkî mezin pîs-hezam,
Qey te bêjî am û tam,
Derket ji avê pîse-pîs,
Çi têketa li wî kîs,
Ew radibû li cîê xwe,
Nava deştê xweş,fire,
Diçû berbi çîaê bilind,
Zik erdêra mîna kund,
Gelekî tîbû, gelekî,
Diçû bona ava sar,
Avê kanya wek karbar.
Ew nêzîkî kanîê bû,
Xwexwe gelekî tîbû,
Dor wî tijî kulîlk,gul,
Wî begem kir hezar dil,
Kanîê kire xulexul,
Go: "ew cîê mine esil".
Kire fîtîn,
Stu dirêjî avê kir.
Lê nişkêva ew ma metel,
-Ew çi emel ?

Institut kurde de Paris

Li wan mila, li wan pala,
Bû xişînya xezala,
Berbi kanîya sar hatin,
Ku ava sar jê hildin,
Û dev kirne ava sar,
Vexwarin mîna xwe hercar.
Ça xezala dît kûsî:
-Hey,hey kûsî,çi pîsî
Gotin lê dîsa vexwarin,
Mîna xweye hercarin.
Lê kûsî ku xezal dît,
Pişta kudik mîna zîn,
Mede levxist: "Heta saxim,
İdî vê avê venaxwim,
Çimk xezalê devheram,
Eva ava vexwarin..."
Ku çivîkê ev yek dît,
Jorê kire vîtevît:
-Poşman bûyî, ay kûsî ?
Nav gişkada tî pîsî.
-Hilbet poşman bûme ez,
Ev xezalê revek, bez,
Herimandin ev kanîya,
Ku dikşe van banîya.

Institut kurde de Paris

## HESK Û BEROŞ

Beroşa mezin, govekber,
Kuçkek danîn, ew dane ser,
Ser agir dikelya nermik,
Û vekiribû torbê derewê germik,
Wê xwexwe peyî didan xwe,
Digot: "Ez hatime Stambolê ese,
Rengê minva kê nemaye metel,
Sultan min hiz dikir pir ecel,
Ça beroşa wîye xase bedew,
Minda xwey dikir mast û dew.
Bi destê xwe sultan,
Minda levxistye xwarinê navgiran."
Wa ser agir û navda şorba bêfeyde,
Qilpeqilp bû, dida pesnê xwe.
Ku gilî gihîşte binê beroşê,
Çapê derket bi peyê wêyî boşê,
Go: "Îdî çi bêjim,
Binê min xwe ne tase,
Binê min tev zêrê xase."
Ku ev bihîst heskê îd nekir tab,
Hilda vî teherî û wa kir cab,
Go: "Beroşa qureye babax,
Virê mezinra tim divî atax,
Kê go binê te temam zêrė,
Derewînara ez bidim çêre...
Ku binê teye tev zêre zer, gevez,
Lê tu zanî ez ku têm qerez ?

Institut kurde de Paris

## TEJİ Û KÊWRÛŞK

Ro hê nîvro,
Li nav deştê,
Ku hê tiştê teze xweş tê,
Kêwrûşkeke rindik,
Hevekî kundik
Razabû xweş-xweş,
Didît xewnê nexş.
Ka çi zanibû wê kêwrûşkê,
Ku am-tam bû mîna xûşkê,
Wekî hatye li nav kewşen,
Nêçîrvankî dihok û den,
Xwera anye revek tejî,
Lema tamarek lê nehejî...
Ew digeryan deşt,berpala,
Digeryan kêwrûşka û xezala,
Wekî bigrin û bê talaş,
Xwera bikin taştêke baş.
Û ku xuşîn ket guhê wê,
Wê nihêrî vê ecêbê,
Nêçîrvanek berbi wê tê
"Min qirikê" ji xwera got,
Guh xişt kirin û kirine cot,
Wê nihêrî rengê tejî,
Ew quloz bû û cî bezî.

Institut kurde de Paris

Dûrva mêşek dihate xwan,
Dûrve ewê kire gotin,
Wekî here nav mêşê six,
Û xilasbe ji tejîyê meriz.
Ew çi ecêb, tejî wêra qe ne digîhişt,
Reva xweda qe qisûr nedihîşt,
Wa qasekê, gavke din,
Nêçîrvan û sê gazî kirin,
"Xilas nabî tu destê me,
Em te digrin îro ese."
Lê kêwrûşkê xwe avît mêşe,
Bira lingê te jî bêşe,
Û ew kete qulka xwe kûr,
Nermik, germik mîna tendûr.
Tejî xwe da ber wê korê,
Ça kir nekir têra neçû,
Serî tu car neçûyê zorê.
"Were mira bêj, kêwrûşk can,
Rind jî narevî, ay ez heyran,
Lê çi ecêb, ew çi fende,
Were rastî minra bêje,
Ça kêrûşkê negirt tejî ?"
Kêwrûşkê îjar dest kire cêv
Got ew ecêv:
"Reva te bona yekî dine,
Lê reva min - emrê mine".

Institut kurde de Paris

## DARBIR Û DAR

Darbirekî jîr û xurt,
Rabû rîya mêşekî girt,
Ber darekê kir giregir:
"De were vê darê nebir..."
Daterişand, awqas lêxist,
Lê dar tucar erdê nexist,
Ew ya çam bû, çiqil dirî,
Kê dikarbû ew bibirî.
Het êvarê mêrkê darbir,
Çiqas karibû kir giregir
Tenê çiqlê darê birîn,
Darê kokêva nekire xurîn...
Çiqas lêda, çiqas westya,
Koka qalin danewestya.
Qarqarke go: "Te pê çivya
Herkê karibya ew bibirya".
Darbir anî çivîyê merxê
Hêdî, hêdî dan ber çerxê
Ku bikute li nav çame,
Şuxulû wî jî bive tame.
Lê çawa kir, ça çerçirî,
Tucar nekir serederî,
Pêda-pêda xûn bûn herd dest,
Çivî dixist - têda dişkest.

Institut kurde de Paris

Qarqar jorda firî,kenî:
"Oro mêrko,qe ne femî,
Gere çivîyê çamê çêkî
Serederîyê wekî lêkî".
Darbir çêkir çivîyê çame,
Wekî teze lê bê qame.
Û çivîyê çam kutane dar
Paşê hêdî ew hate xwar.

Vir gotine:
Hergê zewal ne ji darêve,
Darê timê wê karêve...

Institut kurde de Paris

SEÊ BIRÇÎ

Gundekî mezin û giran hebû,
Û du zîaret: yek jor, yek jêr,
De gunde, se lê ese hebûn,
Bê se dibin gundê xêr ?

Û wa hebû, tunebû,
Vı^gundê handa sekî birçî hebû.
Ew tim wa birçî,
Lêdayî qamçî,
Û him jî diz bû ew,
Didizî şîr û dew,
Wa rojkê roja,
Gundê li beroja,
Merî gi top bûn
Berbi zîaretê çûn,
Û serjê kirin wan dîk û mirîşk,
Û çêkirin wan nan û hewrîşk.
Kêf kirin, geryan,
Li wan bilindcîyan,
Dilîstin qîzê xas,
Û xortê bi hewas.
Agir jêlva jor quloz dibû,
Ew dera çarnikal toz dibû.
Ew seê hanî çevqul û diz,
Ku li wan dera dikir vizeviz,

Institut kurde de Paris

Go: "Ez herime zîareta jêr,
Ku wira zikê xwe bikim têr,
Bira xurekê vir bimîne,
Ew jî para mine."
Û ew revî zîareta jêr,
Wekî zikê xwe bike têr.
Lê heta çû gihîşte wir,
Melûl nihêrî ewî seê dir,
Dît ku xurek gişk xwarine.
Herçî mayî tev birine.
Ziman derxist birçî bezî,
Qudum binda wir lerizî:
"Gelo kengê bigîjime cî,
Ku nemînim ez wa birçî".
Ew ku revî gihîşt cîê xwe,
Dît ku şuxul bêfeydeye,
Çiqas hebûn,ew berx û kar,
Serjê kiribûn wana bi dilbar
Heta hestu jî kotibûn,
Hestûk nema ku ew bixwe,
Bira li vir serê xwexwe...
Çi kir, nekir, fikirî,
Çi bike, teze rûniş girî,
Hêja nifir xwe û bext kir,
Lê bext ça ke, ew bextê wî,
xwexwe dize, xwe çevbirçî,
Ewî xwexwe kir çevqulî.



Institut kurde de Paris

BEQ Û XEZAL

Tîra nêçîrvan sertûj,
Nav dilê xezalê ket kûr,
Wê kir hêwirze, qûjeqûj,
Û xezal ket çîakî dûr.
Xezala dil birîndar,
Ancax berbi kanîkê çû,
Wekî vexwara aveke sar,
Çi bike, carkêva dimir diçû.
Wexta vexwar dil hênik bû,
Kire nalîn, çû deverûya,
Ewî îdî xwe şik bû,
Ka kî hebû serê wan çîya,
Wa nişkêva beqek derket,
Beqekî reş ne tiştkî.
Û sekinî lingê xwe kot,
Xazalêra gilîk wa got:
-Ax, ez kor bim,
Te ha nevînim,
Xûşka xezal,
Xûşka delal,
Ji kîjan gula,
Ez tera çêkim,
Melhema dila,
Yan kîjan avê,
Birîna te bişom,
Xût evê gavê.

Institut kurde de Paris

Ew çi bexte,
Ew çi wexte,
Tu hê cahilî,
Û wa dikalî.
Ax, xûşka xezal,
Ax, xûşka delal,
Ez jî mîna te,
Wa bêbext bûme,
Me çî - war xwe hişt,
Van deran rahişt,
Temam derdê van nêçîrvana,
Hatin derketin li van kevana".
Vira xezalê bi kul û keser,
Beqê heramî, rengpîs nihêrî,
Paşê berê xwe li beq guhêrî:
-Ez xezala çîaê bilindim,
Digerim li ser av û kanîya,
Fesalê xweva gelekî rindim,
Diçêrim li kulîlkê banya,
Ez lingê xwe dişom xunava,
Dilîzim tîrêjna sivê xasra,
Xwe dikî hevalê min tu evan gava ?
Here bêje yeke nenasra...
Û ez namirim birîna xwe,
Ez xût dimirim vê kula xwe...

Institut kurde de Paris

## BERX Û GUR

Li pêşya çîê,
Doza kanîê,
Kerî xwera diçêrya,
Nava kerî berxek hebû,
Merî lê dima heyr û temaş,
Liva nermik û xal-xal,
Xwexwe rindik û delal,
Xwera diçêrya û dilîst,
Dengê xirav wê nedibhîst.
Û nişkêva ew ser kendêl
Şimitî û jorda bû xar.
Jor nihêrî, kire nalîn,
Serî mêlbû, kire axîn.
Dengê berxê ku hat zîz,
Jêrê bihîst gurekî pîs,
Yekî birçî,
Lingî topal,
Kotî, genî,
Rengî tenî,
Devxûnî sor,
Lê bextê wî tim pêra baş,
Wa gihîşte berxa qerqaş.
Berxê gelek lava lê kir,
Go: -Were remê, min nexwe,
Bira gurekî din min bixwe.

Institut Kurde de Paris

-Çima axir, -gur jê pirsî ?
Berxê cab da: -Gelek pîsî,
Heyfe, gurê wek te heram,
Berxa bixun wa am û tam.

Vir gotine: "Bira merî,
Kuştîyê merva mêrê başbe,
Wekî paşê bêtalaşbe."

Institut kurde de Paris

## HIRÇA AQIL

Bibhên mesela min niha,
Xwera hildin qîmetê baha.

Meşekî kûrî mezinda,
Gelekî ji dûrî gundda,
Li wir dereke vekirî,
Têda hingivê şekirî,
Moza dabû hev têda,
Kê dikarî destê xwe lêda,
Xweyê hingiv îd hirçbû,
Ew kudika guh pirçbû,
Ku digerya mêşê kûr,
Li wan dar û bestê dûr,
Wexta birçî dibû ew,
Wexta îdî nedihat xew,
Berbi wê darê dihat,
Lepê xwe dikir nav hingiv,
Moza dikire give-giv.
Lê kudîka delodîn,
Wê dixwar hingivê şîrîn,
Rokê qarqarkek hate wir,
Nihêrî hirça hingivxur,
Gotê: "Hirçê, du bira,
Tiving milda tên vira,
Wê te bidine ber gulla,
Ew nanhêrin çev, biruya,
Rave bireve ji vira."

Institut Kurde de Paris

Hirçê gava ew bihîst,
Xwe ser lepada rep avît,
Kete nava bax, tûma.
Çendek şûnda dîsa hat,
Bixwe hingivê mêşe,
Zimanê xwe hingivda,
Xwera têr xwar û kenya,
Qarqark dîsa hat jorê,
Hirçê nihêrî vê dorê:
-Hela binêr,hirça dê,
Gundek temam berbi te tê,
Wê te bidine nav dara,
Bikujin bivin pê bara.
Kê dikare gundekî ?
Hirçê gava ew bihîst,
Hela şabûna cîda lîst.
-Ew çi ecêb, hirça dê,
Axir, gundek berbi te tê,
Tu direvî du bira,
Lê niha gundek tê vira,
Bêje eva çi-hewal ?
Minra bike galegal.
-Ezê bêjim gelek kin,
Lê tu nevêje kesî din,
Herdu biraê bikevne xîretê,
Lê yê dinê birevin.

Institut Kurde de Paris

## ŞÊRÊ KAL

Mêşekî mezin, mêşekî sixda,
Şêrekî şêra berêda dima,
Her ew bû padşê wan çîa û banya,
Wan kevir kuçka û li wan gelya,
Şêr hukumdar bû ser terewula,
Xofa wî hebû ser hemû dila.
Saw jê dikşandin gur û hirçê dîn,
Û rûvîyê fêlbaz, dilda tijî kîn,
Ji orînya şêr teyr û tû hemû,
Ser çiqlê darê diricifîn zû.
Kê wê dilkira bikira çivtîn ?
Kê wê dilkira bikira zûrîn ?
Çaxê şêrê şêr besta kanî lê,
Xwe rast kiribû ber pencê tevê.
Meh meha diçû, sal sala diçû,
Û şêrê şêra belengaz dibû,
Ew pir kal bibû, ji xwe acizî,
Çaxê rê diçû tev dilerizî.

Wî mêşê mezin û mêşê sixda,
Rûvîkî delkbaz berêda dima,
Ew jî mînanî kal û pîrê xwe,
Şêwra mala xwe dikir kereker,
Û gava rûvî bihîst wê rojê,
Ku şêrê şêra naçe reqasê,
Naçe şîn-şaya, naçe dewata,

Institut kurde de Paris

Nake ore-or, nakeve lecê,
Go, şêrê mêşe hilbet kal bûye,
Qewata berê diha nemaye.
Û rûvîyê fêlbaz dêla xwe hejand,
Berbi lana şêrê bêtaqet lezand,
Go: "Şêrê şêra, tu xweyê mino,
Xudanê mino, ronaya mino,
Çi te, çi xwedê ezê veşêrim,
Hetanî kengê awa bêfeyde,
Heryek ji xwera, heryek bû seyde,
Heryek bêqanûn, heryek bê qeyde,
Vî mêşê mezin, vî mêşê meda,
Hetanî kengê, hetanî çi çax,
Dilê me birîn, dilê me bi dax.
Emê bimirin awa saxe-sax,
Biratîya helal were qebûlke,
Tu birê gewre, ez birê kiçke,
Emê tev herin bigrin kêwrîşka,
Her tu car-carna dua li mike,
Dinya wê şêne, kêra bimîne ?"
Ji germa nîvro, ji vê kalbûnê,
Dest birçîbûnê, dest tunebûnê,
Ew şêrê şêra, xudanê besta,
Ker dihênijî, wê çi bigota ?
Wê çi bigota, taqet lê nema,
Go:"Rûvîyê bira, ser çeva hatî,
Ser sera hatî, bêjime rastî,

Institut kurde de Paris

Kal bûme îdî, qudum nemaye,
A mirina min ber çevaye,
Ez qe dil nakim gavek rê herim,
Ezê bi çi dilî toz-dûman rakim,
Ezê bi çi dilî bême nêçîrê,
Bidime ber xwe oxira xêrê,
Na, ez nikarim, bawerke rûvîo,
Tu vegere, vegere îro."
"Dilê xwe neke, tu xema meke,
Kela dilê xwe qe jî ra meke,
Her îro şûnda navê te şêrî,
Bira ser mibe, ser min nebxêrî,
Nêçîrê bînim, emê bi rastî,
Hevra nivîkin, sozê biratî".
Bawer kir gilya şêrê belengaz,
Dilê wî rem bû, ewe tim xêrxaz.
Mehek yan dudu wa kete navê,
Rûvî tim diçû nêçîra deştê.
Şêr bere-bere ser xweda dihat,
Dicivande sehet û qewat.
Saweke giran kete ser rûvî,
Xwera fikirî, go:"Wey li min mêrî,
Kî ku dibihê, kî ku dizane,
Ez birê şêrê gaz - gêdûkame,
Ji min ditirse, ji min direve,
Ji dîtinya min tev diricife.

Institut kurde de Paris

Hela hê wexte, eva jî bexte,
Navê şêrê ji mira rexte,
Gere ruhê xwe ji vî heywanî,
Ji vî nezanî xilaskim eynî,
Şêrk ser xweda hat, çev lê çirûsîn,
Nasnake xwedê, nasnake kesî...

Berê êvarê,ro ku çû ava,
Rûvî nerme-nerm hat bal birê xwe,
Go: "Şêrê bira, zanim berêda,
Şêr bûne timê kal û pîrê te,
Herkê dil bikî û tu bixwazî,
Mîna kêwrîşka dikarî banzdî.
Herkê dil bikî û tu bixwazî,
Mîna gurê har karî vegezî.
Herkê dil bikî û tu bixwazî,
Dikarî bivî teyrekî bazî.
Dirya xwedêbe, xwedê te xweyke,
Sura cinsê xwe mira gilîke,
Gelo, kê ? Kengê ? Çawa dikare
Yekî mîna te bigre û altke ?
Bû pîrqîna şêr, şêr xwera kenya,
Go:"Rûvîyê bira, qe kê bihistîye,
Meriv sura xwe ji birê xweyke
Sura min çiye ? Bigre bernede,
Bi darekêva mi hişk girêde,
Ezê bê qewat, ezê bêtaqet,
Ber dest-pîê te bibime seqet".

Institut kurde de Paris

Rûvî pir şabû, ewe fêlbaz bû,
Pey wan gotina cîê xwe rabû,
Şêrê serîqoç bir bin darekê,
Darêva şidand dest-pê wê demê
G: "A, şêrê şêr min tu mast kirî,
Min vî halê xwe tu jî altkirî".
Xeberê rûvî mîna gullekê
Dil hinavê şêr peritand danî,
Şêr xwe lepidand, şêr xwe hilbirand,
Orînek hiland, erd-ezman hejand,
Ew gelî geboz hemû lerizand,
Şirît û zincîr darêva qetand.
Rûvî ev ku dît çok lê lerizîn,
Bi fen-fêlê xwe kire gazinî:
"Lê qe wa dive, eme birane,
Eva saleke ez tu virane,
Tu mi hiz nakî, mi bawar nakî,
Xebera rastîê mira navêjî,
Min xwest bizanbya: mira helalî ?
Bi ruhê xweva çiqa zelalî ?
Na, tuî qelpî û bêîtbarî,
Nakim ez tera diha biratî".
Şêr ji xwe şerm kir, şêr xwe acizî,
Pey rûvîya fêlbaz wa kire gazî:
"Were, de were xeyda te cîye,
Çira dihêlî diçî berbi çîa ?
Sura mala me, sura cinsê me,

Institut kurde de Paris

Sozê birayê divêjim te,
Van herd lepê min eger bidî hev,
Hevva girêdî bi şirît û ben,
Ber pêxembera, ber rebbê ezîm,
Dinya şedeye ez tême raê."
Rûvî qestene lê kir gazî:
"Hey,şêrê şêra, tu jî virekî,
Tu jî ditirsî sura xwe vekî..."
Kela şêr rabû, şêr xwe qinciland,
Ji êşa dilê xwe orînek hiland,
Ew gelî, geboz dîsa lerizand
Go: "Bawar nakî ? De bicerbîne !
Ecêba giran çeva bibîne".

Rûvî bi kendir, rûvî bi şirît,
Bi benê pişta fesela xwe dît,
Hate bal birê, temenek hiland,
Herdu lepê şêr hevra hişk şidand,
Paşê hêdîka xwe da alîkî,
Dêla xwe hejand gote rûvîkî:
"De, şêrê şêra, ca xwe carekê,
Biliptîne, tubixwe û xwedê,
Pirça pişta xwe bide ber bê,
Çika gilyê te rastî heye tê ?"
Şêr xwe lipitand, şêr xwe cî hejand,
Şêr wir hingirî, şêr xwe hilpirand,
Pirça pişta xwe kir şijûn da bê,



Institut kurde de Paris

Sor bûn ji xûnê keskê çevê wê,
Zor da çokê xwe, zor da lepê xwe,
Şirît û kendîr lep givaştin hev.
Şêr belengaz bû, şêr xwe qinciland,
Ser derd-kulê xwe rûnişt û lûvand.
Rûvî ev ku dît qudum hat berda,
Nêzîkî şêr bû, têr kenya serda,
Paşê bêminet pişta xwe da şêr,
Go: "De, ma xatir, şêrê kalemêr..."

Hergê du-sê ro, hergê hevtekî,
Wa kete navê, mîna teyrekî,
Mişkê bin xwelyê - nasê wextekî,
Hat û bêminet ber şêr sekinî,
Go: "Padşê mêşa, padşê me hemya,
Qe ecêba wa kê ji me dîtye ?
Tu wa bi mirûz, tu wa bi pirçû,
Ji cî nahejî, naheje birû,
Çi te qewimî ? Çira navêjî ?
Dibe ta girtye ? Dibe serêşî ?
Bêje, şerm neke, çiva dikarim,
Bême komekê, kêfa te rakim ?"
Serê xwe hilda şêrê zeman dî,
Go: "Min bistir, dirya xwedêbe".
Terka şêr neda mişkê bin xwelyê,
Go: "Nak nebûye, bêje vê demê.

Institut kurde de Paris

Çi te qewmiye ? Çima melûlî ?
Çima tu usa bi deng zelûlî ?
Derdekî teze mira çê neke".
Şêr xwe zeft nekir,ziman lê gerya,
Qisa xwe rûvî go û pir girya.
Kela mişk rabû, mişk rabû ji pîya,
Çêrî hemya kir, çêrî wan rûvîya,
Ku dixapînin şêra û gura,
Dibine heval, dibine bira,
Paşê radibin bi fên û fêla,
Hin wan dikenin, hin bav, hin bira,
Go: "Mi bawarke, şêrê me hemya,
Dinya ha hatye, ha diçe dinya,
Azaya te jî bi destê mine, -
Derd û kulê min bes-besê mine."
Go û banzda mişkê bin xwelyê,
Rabû ser lepê şêrê, wê berîyê,
Bi dev û diran kot şirît û ben,
Berê xwe da şêr bi henek,bi ken,
Gote şêrê şêr: "Zanî,bira can,
Deyndarê minî bi ruh û bi can,
Min te aza kir, min emir da te,
Her min paqij kir tenîya enîya te".
Şêr bi şêranî dua li mişk kir,
Go: "Belê, raste, ezî vir hada
Borcdarê tebim bêgilî, sade,
Got û cî rabû, hemdê xwe rê ket,
Ew şêrê şêra ji mêşe derket.

Institut Kurde de Paris

Teyr û terewil tev dorê civyan,
Gi jî ecêb man jê kirin pirsyar:
"Ev çi ecêbe ? Çi te qewimye ?
Kê tu êşandî ? Kê aciz kirye ?
Tu kuda diçî padşê me padşa ?
Li van rê dirba, van kaş maşa,
Van kevir-kuşka, nav van qereca,
Tu em dikarin bijîn bêy padşa ?
Dirya xwedêbe, nahêle naçe".
Şêr li wan nihêrî, serê xwe hejand,
Go: "Min vegerin, ez bextê weme,
Dihā nikarim bimînim cem we,
Ez ku wextekî xweyî - xudan bûm,
Li van çol-besta, li van çîa-banya,
Roja îroîn bûme pêkenîn,
Ez bûme robet bal dost neyara,
Ez bûme dîlê rûvîkî fêlbaz,
Û azakira mişkekî xêrxwaz."

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Nado û Nazê

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## NADO Û NAZÊ

Bi gul û sosinê hezar rengî,
Xemilî bû Sîpan çîaê bengî.

Li şaxê Sîpanê ba diguvand,
Bilûra şivana bi eşq dilûband.

Ji kilama xweştir, ji kulîlka geştir,
Nazê gul dida li çîaê Sîpanê.

Ji bedewa bedewtir bû Nazê,
Ew gula geş bû li çîaê Sîpanê.

Bi çevê xwe reş xort dîn dikir,
Kê ku ew dît, xwe jî bîr dikir.

Kezî bela dibûn ser namila wê,
Cêr ser mila bû ew diçû avê.

Mîna xezala diçû sivik û hêsa,
Bejn û bala wê zef diman tima.

Rojekê Nado dûrva Nazê dît,
Wê rojê Nazê dûrva Nado dît.

Çîaê Sîpanê bû xemla rengî,
Ser Naza rind Nado bû bengî.

Institut kurde de Paris

2

Hîjde bahar emrê Nazê bû,
Osêê bavê wê şivanekî eyan bû.

Stûna malê bû, çira bavê,
Taê tenê bû Nado, kurê dê.

Berxwan bû ew li sîngê Sîpanê,
Berx diçêrandin bi miqamê bilûrê.

Hub diniqitî ji bilûra wî,
Dengê bilûrê guhdar bû çîa, banî.

Wî diçinî gulê awaze rengî,
Bona Naza xwe, ku ser bû bengî.

Pirseke Nazê, yan dîtina wê
Nadora hêja bû malê dinê.

Ji kubra hubê Nado û Nazê,
Hev têr nedibûn bi xeberdanê.

Û bi ramûsanê gur - alavî,
Agirê hubê dilê wanda dişxulî.

Gula çîaê Sîpanê bû Nazê,
Bi bedewîê ew bû xemla Sîpanê.

Institut kurde de Paris

3

Li çîaê gulxemilî, Sîpanê,
Begekî zef zulmkar dima wê.

Dewletî bû zef, xweyê her tiştî,
Bêhesab bû hebûn, kerî û sûrî.

Revoê hespê wîye erebî hebûn,
Bê hesab xulam û xizmetkarbûn.

Li sîngê Sîpanê gul û xemilî,
Pez, dewarê wî bû bi kerî û sûrî.

Çevqulî netêr mîna zîakî,
Li dor kanîê girtî, piçikî.

Wî vedixwar ava kanîa qudretî,
Riat û ehelî wî dihîşt tî.

Koçiksera wî sîngê Sîpanê,
Mîna teyrekî tar girtibû wê.

Jorda dinhêrî bintara çîê,
Koxkê gundyaye bilind ji xwelîê.

Riata wira - tev bindestîê wî,
Tev dilerizîn ji tirs, sawa wî.

Sawa wî hukum dikir her dera,
Hêrsa wî şûr bû, pirsa wî-kela.

Institut kurde de Paris

4

Rokê dewrêşekî kal hate wira,
Ber koçkê sekinî û metal ma.

Paşê rûnişt ser kevirekî wir,
Qelina destê xwe vêxist û geş kir.

Wî qulap - qulap li qelinê da,
Melûl dewrêş wir ket bera fikra.

Wî go: -Ecêbe ev dinya,
Emir ne yeke bona her benda.

Li vê dinya gul xemilî,
Bende temam cûrekîne.

Bende temam xwedê xuliqandine,
Hinek têr, sibhan, hinek birçîne.

Hinek dijîn birc û serada,
Hine-koxkê terî binerdda.

Hinek xwe dikin etles û qumaş,
Hinek tazîne, bê kinc û libas.

Hinek dixebitin, hinek dixun,
Hinek digrîn, hinek dikenin.

Dewrêş kêm nedikir dûê qelinê,
Duşurmîş dibû ew vê fikirê.

Li rewaqê rûniştî begê har,
Xweş-xweş ewî qewe vedixwar.

Institut kurde de Paris

Wî dît wira ew dewrêşê kal,
Xulamek şand, go: -Bînin mal.

Xulamek çû dewrêş anî,
Li ber beg dewrêş sekinî.

-Kêî tu, kalê, ku te nasnakim ?
-Dewrêşekim ez,dinê digerim.

Digerim timê belengaz, bêmal,
Gund û bajara ez dibim mêvan.

Zef tişt dibînim, metel dimînim,
Ji vê dinê ez tiştekî nefemînim.

Yek xudane û yê din xulam,
Zorbe dikute gundîê am û tam.

Mal û hebûnê tev jê distîne,
Birc û serada dijî dimîne.

Beg nişkêva wira kenya,
Dewrêş lê nihêrî şaş ma.

-Dinya ku heye dûve, kalê,
Bibre, bixwe hergê ji te tê.

Kulma xwe wî nîşanî kalê kir,
Go: -Dinêda, kalê, evê hukum kir.

Tu kalekî dinêditî, zaneî,
Gele gund û bajara gerîaî.

Institut kurde de Paris

Bêje qe heye û li kîjan erda,
Mîna koçka min koçk û sera.

Kalê dû ji qelinê gewlaz berda,
Bi dilekî kul ha caba wî da.

-Beg, zef bedewe koçk û sera te,
Bin teva geşda cewahireke.

Bedewe mîna birca padşa,
Beg bi dilê eşq wira kenya.

-Belê raste tu wa dibînî,
Ez kêm nînim ji tu padşaî.

Dewletîme ez bi malê dinê,
Bêhesab kerî, sûrîê min dertê.

Heye revoê hespê mine erebî,
Zêr û zîv timê kîskê min tijî.

Cimeta min tev bindestîê min,
Hezar hev minra xulamtîê dikin.

Çi ku bixwazim, hazire wê deqê,
Ji sivra min kêm nabe goştê berxê.

Beg da peyê xwe û xeberda,
Fîncana qewê wî erdê hilda.

-Raste, begê min, tu zef dewletîî,
Her tiştê te heye, baş dijî.

Institut kurde de Paris

Lê tu cara nikarî bigîjî Nado,
Ji te dewletîtire, qihare Nado.

Kêye ew Nado ? Tu bêje, kalê,
Min zêdetire bi malê dinê.

Beg tevhevbûyî, dewrêş nihêrî,
Fîncana qewê dêstda tirtilî.

-Kurekî kesîbe, şivane li çîa,
Koxekî wî heye li nava koxa.

Dewleta wîye dê, bilûr, Nazê,
Kenê kîjanê hejaye dinê.

Bilind kenya begê xûnxur,
Fîncana qewê paşê velakir.

-Gelo ew kêye, ku êla minda,
Beranberî min be eşq, şabûnêda ?

Emrê şa ezê nîşanî wî kim,
Mîna vê fîncanê ezê wî hûrkim.

Wî fîncana qewê destê xweda,
Kir hezar perçe û avît wêda.

Çî şivanrane bedewa dinê,
Bedew bona begane tenê.

Institut kurde de Paris

5

Dewrêş baba rabû şpîya,
-Bisekine, rûne, dewrêş baba.

Westîaî tu, rûne, hêsabe,
Bixwe û vexwe, dîsa rewîbe.

-Na beg, na, tucar rûnanêm,
Tucar rûnanêm ez ber sivra te.

Nanê te xûne, naê xwarinê,
-Tu çi dibêjî, koçê cenimê ?

Bêje, çika te çawa culet kir,
Ku tu wa xeberdî ber min.

-Dilê min bereke, bereke bê bin,
Tijîye bi hêsirê gundî dibarînin.

Bi hêsirê mîlîon kesîbê gune,
Pêl digîjin hev, dibe firtone.

Ew rojê wê bê, ji kenar derê,
Bin xwevake bega û zulmkarê dinê.

Dinya kevnê hilşe, çêbe ya teze,
Ew rojê wê bê, ew rojê ese.

-Celat, -Kir gazî begê xûnxur,
Celat ber sekinî wê deqê li wir.

Bibe vî kalî, zimanê wî bibre,
Bi vî zimanî ewî serxure.

6

Ro bû nîvro, wede derbaz bû,
Deh sîyar ji koçkê rêz bûn.

Çûn wî gundî,ku Osê lê dima,
Yek-yek pirskirin ji gundîya.

Mala Osê dîtin, çûne hundur,
Rûniştibû Nazê - ew horîya çevdur.

Wê nermik distra bi kubra şîrin,
Dilê wê tijî bi hub û evîn.

Ewê ku distra, hatin derda,
Çend merîê sîlihe destda.

Cîê haş Nazê kir zarîn, girya,
Kengê çivîk xilas dibe ji pencê teyra ?

Yek gihîşt Nazê, Nazê hilda,
Mal derxist, bir cem koma sîyara.

Yekî Nazê avît terkîya xwe,
Bê xem ajotin, birin nêçîra xwe.

Êvarê hat mal Osê şivan,
Dît, derî ser piştê, koxekî wêran.

Ne çira dişxulî, ne jî bi xêrî,
Mîna xirabekî, lê tinebe merî.

Bavê kir qîrîn, kire qorîn, girya,
Go: -Çira,çira qapîyê min vêsya ?

Institut kurde de Paris

7

Wexta ku Nazê revandin birin,
Nado çola ket boy Naza şîrîn.

Gerya gund bi gund, çev tije girî,
Gihîşt koçka beg û ber sekinî.

Wir, wê koçkêda girtîbû Nazê,
Bi dilê kovan hêsir bû xurê wê.

Nado wir rûnişt û bilûr lêda,
Qey te go, melûlyê hilçinî dinya.

"Bahare, bahar li çîaê Sîpanê,
Ji çevê min hêsir, dilê min xûn tê.

Melûle çîaê Sîpanê narîn,
Gulê wê temam derdê te digrîn,

Teyr û tûyê çîaê Sîpanê,
Pirsa te dikin: "Nazê kanê ?"

Dibêjin were, Nazê, were vir,
Tu, Nado mirazê xwe şabin".

Wa distira Nado şev û roê,
Û fitil dida wî dora koçkê.

Beg ku ew dî, ji xulama pirsî:
-Kêye ew xortê ewterî dîn ?

-Ewe dilketîyê Naza dilkevir,
-De, zû wî bigrin û bînine vir.

Institut kurde de Paris

Rabûn xulam mîna gurê beratê,
Nado girtin, anîn koçik - sera axê.

Begê xûnxur wa Nado pirsî:
-Ew tuî, ku Nazê hiz dikî ?

-Xulamê teme, xwelîya bin pê te,
Nazê hiz dikim, boy wê dîn bûme.

Begê çevxûn li wir kenîya,
Go: "Vî binihêrin, eve maşoqa dila.

Vî dînî zû bivin, serê wî jêkin,
Dilê wî bînin nîşanî minkin.

Celat ew bir, qetil jê barî,
Anî cem beg dilê wî xortî.

Beg da destê xwe mîna hinara,
Dilê wî cahilî wî desta guvaşt.

Xûn jê niqitî mîna karbara,
Xûna sor gendî ava hinara.

Bira êla min vê yekê bibhê,
Tu şivan, gavan nekin qeletê.

Çiqa ku hiz kin ew bedewê ha,
Wê serê wanabe ev roja hana.

Bedewê êla min gere ê min bin,
Ku bedewya wan timê ez şabim.

Institut kurde de Paris

8

Awa, ew huba teze gul dida,
Mîna gula çilmisî destê begda.

Nazê girtîbû li koçêda,
Hajpê tunebû, miqim digrya.

Kuştina Nado wexta wê bihîst,
Ji rewaqêda xwe jorda avît.

Mîna cêrekî bû hezar pirtî,
Cinyazê Naza nazike cindî.

9

Ji rû dinê çû ew bedewa,
Emrê beg buhurî mînanî ba.

Çiqa bahar, ku hîv dernaê,
Ewrekî reş dikêwire Sîpanê.

Û direşîne baranê hêdî,
Ser gul, sosinê Sîpanêye tî.

Ewir baranêra dilşewat hêdî,
Gul û sosin dikin şîn û girî.

Sibe ku ron dibe, tim pencê roê,
Temiz dikin xunav, hêsirê hêşnayê.

Institut kurde de Paris

# SERECEM

## ROJÊ MIN


1. Lênînê Mezin .......................... 13
2. Oktyabir .............................. 14
3. Xwelîya Weten ......................... 15
4. Weten Dêyî ............................ 17
5. Li Bin Teva İroîn ..................... 18
6. Hergav Çaxê Ku Bahar Tê ............... 19
7. Bîranîn ............................... 22
8. Ji Rojê Buhurî ........................ 25
9. Ezî Cahilim ........................... 28
10. Ez Hiz Dikim Bahara Bîn .............. 31
11. Dilê Bengî ........................... 32
12. Tê Bîra Min .......................... 33
13. Bîranîn .............................. 34
14. Şemdanê Yêrêvanê ..................... 36
15. Tev Nebîyê Xwe ....................... 43
16. Xanîê Me ............................. 46
17. Xazil Li Te .......................... 48
18. Cemîla Minra ......................... 49
19. Wede ................................. 50
20. Kê Dikare ............................ 52
21. Sala Teze ............................ 53
22. Gurcistanêra ......................... 54
23. Xebera Dayka Şîralî .................. 57


Institut kurde de Paris

## LI NAV ÇIAÊ KURDISTANÊ


24. Çîaêd Kurdistanê .......................... 69
25. Çîaêd Zagrosê .......................... 71
26. Her Qîzeke Me Gulane .......................... 72
27. Kilama Qîza Kurd .......................... 73
28. Zimanê Dê .......................... 74
29. Nema Dê .......................... 76
30. Hergê Şikilkêş Bûyama .......................... 80


## DILÊ BENGİ


31. Pêştirî Min .......................... 85
32. Tenê Ew Tu Bî .......................... 86
33. Hizkirya Minî .......................... 89
34. Teweqe Dikim .......................... 90
35. Vê Êvarê .......................... 90
36. Divên .......................... 91
37. Dinya Bive Hingiv, Şerbet .......................... 91
38. Çîaê Sîpanê Bilinde .......................... 92
39. Xeberdan .......................... 94
40. Xema Neke .......................... 95
41. Xewn .......................... 96
42. Nazikê .......................... 97
43. Min Tu Dîtî .......................... 98
44. Karxezalê .......................... 99
45. Tûncikzer .......................... 100
46. Sifet .......................... 101
47. Delal .......................... 102


Institut kurde de Paris

48. Ser Kanîê ....................................103
49. Delalîê ....................................104
50. Kilamê Bengîya ....................................105
51. Şaîr û Hizkirya Wî ....................................110
52. Ax, Ber Hêsuya Konê Me Reş ....................................111
53. Kanî ....................................112

## LI SER SINGÊ ELEGEZÊ

54. Elegeza Minra ....................................115
55. Li Ser Singê Elegezê ....................................117
56. Dîsa Li Zozana ....................................119
57. Xezalê Çîa ....................................121
58. Xew Li Çeva Herimandye ....................................122
59. Ez Teva Geş Hiz Dikim ....................................122
60. Kulavreşo ....................................124
61. Pêyzaj ....................................125
62. Çi Navê Deynim ....................................126
63. De Xatirê We, Gulê Delal ....................................129
64. Mehê Baharê ....................................130
65. Huba Şivan ....................................131
66. Şev Li Obê ....................................132
67. Ser Topê Gujme ....................................134

## ŞÊRÊ KAL

68. Gundî û Çivîk ....................................137
69. Sulêman Pêxember û Balçêmk ....................................138
70. Deve û Berf ....................................141
71. Kûsî û Xezal ....................................144

Institut kurde de Paris

72. Hesk û Beroş ..............................146
73. Tejî û Kêwrûşk ..............................147
74. Darbir û Dar ..............................149
75. Seê Birçî ..............................151
76. Beq û Xezal ..............................153
77. Berx û Gur ..............................155
78. Hirça Aqil ..............................157
79. Şêrê Kal ..............................159
80. Nado û Nazê ..............................171

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

K.

WEŞANÊN ROJA NU